kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliya navîn

bîrnebûn

BIHAR 2006

Newroza we pîroz be!



30

"Dunya ji ilmê ditirse û ilm jî ji cehaletê ditirse!"

Destbiratî û xwînbiratî

www.navenda-rewsenbiriya-kurdi.org

bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.
Sê mehan carê derdikeve/ Üç ayda bir çıkar.

Utges av Apec-Förlag AB

Hejmar 30, bihar-2006

Ansvarig utgivare
Ali Çiftçi

Redaksiyon
A. Çiftçi, Dr. Mikaîlî, H. Erdoğan, M. Bayrak, İ. Türkmen
M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Sefoyê Asê, Vahit Duran

Adress
Navnîşana li Swêdê
Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige
Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

E-post
info@birnebun.com

Internet
www.birnebun.com

Navnîşana li Almanyayê
Muzaffer Özgür/Bîrnebûn
Postfach 900348 , 51113 Köln/Almanya
Tfn: 0049-(0)172 298 24 51

Biha/Fiyatı
Europa: 5 Euro • Türkiye: 2 500 000 TL.

Abone (ji bo du salan - 2 yıllık bedeli):
Swêd: 400 SEK • Ewropa: 40 Euro

İsveç hesap numarası
(Bîrnebûn) postgiro: 468 65 12-7

Almanya hesap numarası
M. Özgür, Stichwort "Bîrnebûn" Deutsche Bank-Köln
BIC: DEUTDEDBKOE
IBAN: DE66 3707 0024 0591 2662 00
Konto Nr: 5912662 BLZ: 37070060

Belavkirin / Dağıtım
Türkiye
Ankara:
Dipnot Kitebevi, Selanik Caddesi No: 82/32
KIZILAY / ANKARA
Tfn: 0312-419 29 32

Anatolia Muzik Center
Cumhuriyet Mah. Turan Cad. No: 29 A
Polatlı-Ankara
Tfn.: 0090-312-622 94 36

İstanbul:
Selahattin Bulut/Medya Kitapevi
İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 258/6, Beyoğlu

Çap / Baskı
Apec-Tryck AB



Newroza Fittjayê

Her nivîskar berpirsiyarê nivîsa xwe ye.
Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re tên, serrast û kurt bike. Nivîs ger çap nebin jî, li xwedî nayên vegerandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

www.arsivakurdi.org

NAVEROK / İÇİNDEKİLER







Wêneya berg: Kelhasan, foto: Ali Yağcı



2 Ji Bîrnebûnê - **Ali Çiftçi**
3 Civîna Komela ZIMAN û saziyên KAN - **Ecewît Yildirim**
6 Komela piştgirî ya Kelhasan, yaylê Hewsên û Delala - **Ali Çiftçi**
10 Şahiya Newrozê li şaredariya Botkyrkayê **Mehmet Balta/M. Lewendî**
12 Bi berpirsên komela KIRKPINARÊ re hevpeyivînek - **Muzaffer Özgür**
16 Li ser pirsa kurd li Tirkiyê û YE bi Nebî Kesen re hevpeyvînek - **Uskê**
25 Çend biwêj û çend çîrok - **Mem Xelîkan**
28 Hindik û rindik - **Nuh Ateş**
30 Yaranî - **Evîndar Can**
33 Kelhasan - **Ali Çiftçi**
41 Ji bo Xelikaneke ava, pak û bextewar - **Nuhê Hecê**
44 Şîrê bizinê - **Hilmî Yeşîltaş**
47 Li ser çêkirina tewna bi Ayşe Barlas re hevpeyivînek - **Altun Başaran**
48 Destbiratî û xwînbiratî - **Mem Xelîkan**
50 Berî dîrokê mirov û ziman - **Amed Tîgrîs**
63 Bir pazarlamacının gözüyle bizim oralar - **Muzaffer Özgür**
67 Kürecik aşiretinin tanıtımı ve diğer komşu aşiretler - Şahin Aydın
70 Newroz - **Ömer Faruk Hatipoğlu**
71 Elbistan-Pazarcık yöre tarihi ve kültürü üstüne - **Mehmet Bayrak**
80 Serenav, hevenav û daçek - **Amed Tîgrîs**



www.arsivakurd.org

Ali Çiftçi

Destpêka xweş û dawiyeke geş!..

Destpêka her tiştî bi meriv xweş tê. Ya girîng berdewamiya vê xweşiyê ye. Kurdên me berî ku dest bi karekê bikin pirê caran dudilî ne. Ji ber wek netew, nifş bi nifş hatine pelçikandin, hebûn û kesayetiya wan hatiye înkar kirin. Vaya jî li ser kurdên me, bi xwe bêbawerîtiyek peyda kiriye. Kê ji me van gotinên li jêr nebihîstine... wek; *Ma zaten kurd nabin meriv! Ê niha serî hev bişkînînin! Ma kurdan kingê karek heta dawî birine! Kurd ji hev re xayîn in! Bi kurdan bawerî nabe! Bi zimanê kurdî çir bikî lo, ji tiştekî re nabe!* Wek van gotinana em li vir bi dehan gotinên negatîv dikarin bêjmêrin. Bînin bîra xwe û bala xwe bidin ser van gotinên ku di ciwata me de, bê ku haya me lê bibe, em jî car car bi kar tînin. Hem jî li hember zarok û gencên xwe! Helbet dema nifşê nû jî bi wan gotinan mezin bibin, bêbawerî dibin û qimeta ziman û çanda xwe jî nizanin!

Ew psîkolojiya ku ji aliyê dewleta dagîrker, bi zanistî li ser me daye peydakirin, em bi xwe jî bi nezantiye, vî barî li xwe û zarokên xwe zêdetir dikin!...

Di serneketina jiyana meriv de sedema yekem bi xwe bêbawerî ye. Mixabin ev bêbaweriya ne tenê di mesela netewî de herviha di jîyana piraniya kurdên me de tê xuya kirin. Bi casaret gav avêtin, bi xwe bawerî kar kirin, di nifşê nû de peyder pey zêde dibe. Ev hem hêviyekê û hem jî kelecanekê di de me.

Di wan sê çar salên dawî de, bi piranî li welatên Ewropa, pir komelên gundên Kurdên Anatoliya Navîn hatine avakirin. Armanca wan komela/rêxistina her ciqas bi sînor bin jî, dema em bala xwe didinê, em dibînin ku ji xwe û kesayetiya xwe xwedî derketin bingeha herî balkêş e. Ev jî dide xuya kirin ku kurdên me hêdî dixwazin bi şexsiyeta xwe bijîn! Ev destpêkeka pozîtîf e.

Bi avakirina wan komelan, kurd tên ba hev, li hev germ dibin, şevên kulturî çêdikin û bi hev re danûstendineke xort datînin. Ya girîng li vir ev e; divê van rêxistinan/komelan tenê bi şevek an du şevên şahîyê nemînin, naveroka xebatên xwe bi aktiviteyên çandî û bo pêşxistina ziman û kesayetiya xwe ve dagirîn. Xebatên li pêş, ji bo hemû komelên gundan pêwistiyên xwe bi hevkariyeke hevbeş ya netewî, bi taybetî jî, ji bo zimên heye. Li vir barê giran disan dikeve ser ronakbîr û xebatkarên zimên û çandê!

Werin em bi hev re vê destpêka xweş hîn geş û xweş bikin. Bila hêdî dost û dijminê kurdan jî pê bizanin ku em dikarin xwedî li xwe derkevin û nahêlin ku ev çanda me ya dewlemend û zimanê me yê dayîkê yê şîrîn visa sêwî bimîne!

Newroza we giştkan pîroz be!

www.arsivakurdi.org



Civîna Komela ZIMAN û saziyên KAN

Civîna komela Ziman ya bi sazîyên KAN (Kurdên Anatoliya Navîn), di dema 25-26.02.06an de, li bajarê Frankfurt a Main, li mêvanxaneya bi navê Haus der Jugend çêbû.

Civînê li dû xwarina nîvro, bi dengkirina xêratîkirinêya Wahît Duran û Yusuf Polat li ser navê komîta kargêr dest pê kir.

Endamên komela Ziman di nava hev de li hev kirin ku Wahit Duran civînê bi rêve bibe û Ecewît Yildirim jî protokolê binivîse. Wahît Duran rojeva ku ji hêla komîta kargêr a komela Ziman ve hatibû hazirkirin, peşnîyazî beşdaran kir. Li gora wê rojev:

1. Xêratîkirin û hevdûnasîn
2. Beşa Komeleyan

Qalkirina nûnerên komeleyên Celikên Qirkpinara û gundê Omê, Yaşar Güçlü û Celal Atmaca di heqê xebatên xwe de.

3. Beşa Malperan

Nirxandina malperan ji hêla nivîsandin, naverok û teknîkî, ji hêla Mile Kara û Yusuf Topal ve.

4. Li ser girîngîya ziman şiroveyek ji Elî Çîftçî.
5. Programa serbest.

Çend hekat ji Nuh Ateş, çend helbest ji Kemal Harimci, Yusuf Yildiz û hwd.

6. Gilî, gazî û xatir ji hevxwastin

Ji ber ku nûnerên komela Qirkpinara û gundê Omê beşdarî civînê nebûbûn, xala 1. ji rojevê hate derxistin. Di berdewamîya civînê de beşdaran xwe dan nasîn.

Gora wê: Kemal Harimci wek şexsîyet, Ergun Erdal li ser navê komela kurdên ji eşîra Pisîyan (hazirîyên avakirinê didomin), Bîlal Dilovan li ser navê malpera www.anatolîya navîn.com, Bulent Kayacan wek şexsîyet, Ramazan Yüce li ser navê www.hilkecikonline.com û komela EKDAyê, Muzaffer Özgur li ser navê kovara Bîrnebûnê, Elî Çîfçî li ser navê weşanxana Apecê û kovara Bîrenbûnê, Îrfan Koyuncu li ser navê kovara Vegerê, Abdullah Gezer li ser navê kovara Vegerê, Xelîl Ozcan li ser navê Komela Kurdên Altilarê, Yildirim Yüce li ser navê malpera

www.arsivakurdi.org



Yusuf Polat, Vahit Duran, Ecewît Yîldirim û Mile Kara

www.kalebalta com, Tahsîn Demirsoy li ser navê komela Karawittê (Xelikên jur), Hesen Huseyin Deveci li ser navê kovara Vegerê, Faik Balci li ser navê malpera gundê www.tawliya.com, Îhsan Turkmen li ser navê malpera www.xelikan.com (Xeliken jur), Mile Kara li ser navê malpera www.kurdênkirsehîrê.com, Nuh Ateş wek şexsîyet, Bulent Kayacan wek şexsîyet, Reşît Karakuyu li ser navê Weqifa KAN li Swêd, Bekir Dari wek şexsîyet, di civînê de hazir hatin dîtin. Her wiha Yusuf Polat, Vahîd Duran û Ecewît Yildirim jî li ser navê komela Ziman beşdarî civîne bûbûn.

Beşa komeleyan

Di heqê komela Celikên Atkafasiyê CAYVAKê de Muzaffer Özgür, di heqê komela Xelikên Qerecdaxê de Tahsin Demirsoy, di heqê komela kurdên li der û dora çıyayê Hilkecikê EKDAyê de Ramazan Yüce, komela Altilarê Komela Kurdên Altilarê Xelîl Ozcan, agahdarî dan beşdaran.

Di vî warî de Bülent Kayacan di derheqê komela gundê Omê ya li Almanyê agahdarî da û bal kişand ser wê yekê ku komela gundê Omê VALMZ li ser bingeha gundîtîyê ava bûye û tu rûmetê nade nasname û zimanê kurdî. Wî daxwaz kir ku komele zêdetir rûmetê bidin ziman û nasnama kurdî.

Abdullah Gezer jî bal kişand ser wê yekê, ku komele bêtir hevdû kopya dikin û wezîfeyên dewletê jî pir caran heldigrin ser xwe. Şûna wê Abdullah ji komeleyan daxwaz kir ku ew perşpektivan bidin civakê.

Îrfan Koyuncu jî bal kişand ser giringîya perwerdeya bi zimanê zikmakî û pêşniyaz kir ku komele û şexsiyet liv li xwe bidin.

Ji hêla din ve jî zimanê ku çîrok pê tê-ne nivîsandin, ji ber ku bîna devoka KAN jê nayê rexne kir. Ji komela Ziman jî xweşt ku li ser vê mijarê hûr bibe. Kemal Harimci daxwaz kir ku komele li ser bingeheke netewî karê xwe bidin meşandin û pêşniyaza

federasyonê kir. Ji bo pêşdexistina koordinasyona di nava komeleyan de, Bîlal Dilovan pêşniyaza avakirina komîteyekê kir.

Yusuf Topal jî li ser navê www.xelkedondurme.com tevî civînê bû.

Beşa malperan

Di heqê malperên înternetê yên herêmî de Mila Kara nirxandinek kir. Mila di nirxandina xwe de destnîşanî kêmasîyên di nivîsandina zimanê kurdî û nerastbûna agahîyên di heqê dîroka eşîr û gundan de kir. Di dawiya dengkirina xwe de jî pêşniyaza forumeke webmasterên malperên herêmî kir.

Dû wî ra Yusuf Topal rewşa malperên herêmî şirove kir û bal kişand ser kêmasîya dengê jin û zarokan. Ji bo ku malper hîn efektîftir bixebitin, Îrfan pêşniyaz kir ku webmaster di malperên xwe de zêdetir wêneyan bi kar bînin. Remezan Yuce jî pêşniyaza sistema Pal Talk'ê ji bo malperan kir. Elî Çifçî jî pêşnîyaz kir ku serverekî ku tevahîya malperên herêmî bikaribin li ser weşanê bikin, kir. Li dû şîvê, bernama roja 1.ya civînê bi çend miqaleyên Nuh Ateş û helbestên Kemal Harimci bi dawî bû.

Roja diduya

Bernama roja diduya ya civînê, bi dengkirina Elî Çifcî ya li ser girîngî û parastina zimanê kurdî dewam kir. Elî Çifçî di dengkirina xwe de dîyar kir ku di hebûna me ya wek civak de ziman faktora herî sereke ye û eger zimanê me wenda bibe, wê çaxê civak jî dê ji hev dûr bikeve. Li alîyê din, ji bo rastnivîsandina kurdî pêwîstiya bi kursekê anî zimên.

Di berdewamiya civînê de, Bulent Kayacan pêşniyaz kir ku di Bîrnebûnê de ji bo sererastkirina şaşitîyên di nivîsandin û dengkirinê de quncikek were avakirin.



Uskê Cimik

Ji bo rastnivîsandina kurdî, Yusuf Polat pêşniyaza kursekê kir. Nuh Ateş pêşniyaz kir ku civînên veng bi awayekî salane werin çêkirin. Di dawîya civînê de biryar hate girtin ku civînên sazîyên KAN bi awayekî perîyodik bidomin.

Ji bo komeleyên ne beşdar jî careke din tevî civînê bibin, hazirîyeke bi rêk û pêk daxwaz kirin.

Heger civîna bê li Skandînavya were kirin, Reşît dê organîzekirina wê pêşnîyazî Weqfa KAN li Swêdê bike.

Ji bo hazirkirina kurseke xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî di demeke nêzik de, komela Ziman hate wezîfedarkirin.

Amadekar: Ecewît Yildirim
Haiger, 06.03.2006

www.arsivakurd.org


Ali Çiftçi

Komela piştgirî ya Kelhasan, yaylê Hewsên û Delala
(Kelhasan, Turanlar ve Korkmazlar Dayanışma Derneği)

Di 07.01-2006 an de li Kopenhagê, saet 14 de bi civîneka beşdariya 45 kesan ve komele hatiye damezrandin. Civîna avakirina komelê çar saetan ajotiye. Piştî dîtin û pêşniyazan, destûra komelê ji alîyê beşdarên civînê ve bi yekdengî hatiye qebûlkirin. Di van çar saeten de herkesi li gor xwe, dîtin û pêşniyazên xwe pêşkeş kirine.

Li ser avakirina komelê, birêz Süleyman Yaşar(serokê komelê) pêwîstiya avakirina komelê wiha dibê;

–Di van salên dawî de dubendiyek li gund çêbibû. Me xwest bi organisesiyoneke wiha dawiya vê dubendiyê bînin. Bi karekî haka em dixwazin hem bi însanên Kelhasan û hem jî bi derû-



Süleyman Yaşar



Civîna avakirina komelê

www.arsivakurd.org



dora xwe re nişan bidin ku ev kudret û kuweta me heye ku em jî dikarin bi hev ra, hem ji bo belediya xwe û hem jî, ji însanên xwe re xizmetekê bikin. Em ji niha de hinek bi serketin!

Di derbarê destûra komelê û karên kulturî de jî birêz Süleyman wiha dibê:

–Sebeba ku me deştûra xwe tenê bi du armanca ve sînor kir, ev bû; di hinek nokteyan de dîtinên cuda hebun. Me jî xwe bi armancên muşterek ên asgarî ku kes nikaribe xwe jê dûrbixîne, bisînorkir. Deştûra ku ji bo komita gişti hatibû hazirkirin bi armancên hîn berfereh û rind hatibû dagirtin. Lê mixabin me nikaribû bidin qebûlkirin. Ez hêvî dikim, em ê di rojên pêş de deştûrê hîn berfereh bikin.

–Di karê kulturî de em dê salê yek yan du caran şevên şahiyê yên kulturî bi muzik û xwarin ji bo piştgirî û hevkariya înasanên xwe bikin.



Dîmenek ji civînê

www.arsivakurd.org

–Heta niha pir rexneyên pozîtîf û negatîf hatin. Piranî ji bo avakina komeleyeka wiha pir xenî bibûn. Rexneyên erênî(pozîtîf) pir pir bûn. Hişyariyeke haka pir pozîtîf zevqa karkirinê li ba me hîn bilindtir kir.

–Rexneyên negatîf bêbaweriya însanên me dida nîşandan. Wek; "kelhesenî nikarin komeleyek aka bimeşînin! Bi demeke şûnda ê bêt girtin!" Ji dîtinên aka yên bêbawerî bersiva herî baş gundiyên me bi endambuna xwe nişan dan. Kî çi dibêje bila bêje. Însanên me bi endambuneka aktiv bersiva van dîtinên negativ, baş dan. Heta niha zêdeyê 1100 kes bûne endam. Hema hema giştikan jî endametiya xwe dane. Em bawer in sala tê endamên me yê du hezaran derbasbin.

–Dixwazim bi rêya kovara Birnebûnê bangekê ji hemû însanên me yên li derweyî welêt dimînin re bikim. Xwedî li komelê derkevin. Bi piştgirî û pêşniyazên xwe ve alikariya komelê bikin. Ew organizasiyoneka yekem e, ji bo gundiyên me. Ji bo me Kelhasanek tenê heye. Ji bo vê jî karê ku dikeve ser milê me giştikan, divê em bikin!..

Beşdarên civîna gîştî;

1- Ahmet Ekici
2- Nazım Atıcı
3- Cemal Özden
4- Hamza Karaman
5- Ömer Karaman
6- İbrahim Yaşar
7- Ömer Avcı
8- Doğan Taşkın
9- Mustafa Ceran
10- Derviş Yıldırım
11- Haci Çakmak
12- Haci Veyis Bozkır
13- Mehmet Polat
14- Mehmet Büyükyorulmaz
15- Mustafa Özcan
16- Raşit Büyükyorulmaz
17- Mehmet Avcı
18- Kemal Doğan
19- Dede Baran
20- Bekir Dalan
21- Ali Çakmak
22- Süleyman Yaşar
23- Hasan Yaşar



www.arsivekurdi.org



24- Bekir Yaşar
25- İbrahim Seçilmiş
26- Bekir Dalan
27- Bayram Yaşar
28- Mahmut Özcan
29- İlyas Sertdemir
30- Mevlüt Özdemir
31- Cevdet Özdemir
32- Süleyman Özdemir
33- Hacı Yaşar
34- Bekir Doğan
35- Ahmet Çakmak
36- Fahri Özcan
37- Mustafa Avcı
38- Kasım Özcan
39- Fuat Atıcı
40- Ecevit Özcan
41- Battal Turan
42- Memet Özcan
43- Recep Avcı
44- Mustafa Korkmaz
45- Mehmet Yaşar

Komita kargêr(Yönetim Kurulu)
Serok(başkan): Süleyman Yaşar
Alîkarên serok(başkan yardımcıları):
Mehmet Avcı, Mustafa Özcan
Muhasebe: Bekir Dalan
Sekreter: Dado Can Baran
Mehmet Seçilmiş
Raşit Büyükyorulmaz
Mustafa Ceran
Cevdet Özdemir
Doğan Taşkın
Erol Karaman

Edresa komelê:
Godthåbsvej 170 st.
2000 Frederiksberg/Danmark
Tlf: 38 119 119 Fax: 38 119 119

Herroj di navbe ra
saet 13.00 - 16.00 de vekiriye.

Bi xêr bên!

Wêne ji ***Kelhasan.info*** hatine wergirtin.

www.arsivakurd.org

Şahiya Newrozê li Stockholmê, li şaredariya Botkyrkayê li dibistana Tallîdê









Di 21ê adarê, saet di 14.00 de, li dibistana Tallidê şagird, malbad û mamostên dibistanê ji bo pîrozkirina newrozê kom bûn.

Şagirdên dibistanê û mamostên kurd şahiya Newrozê li dar xistin.

143 şagird, 43 malbat, 32 mamosteyên swêdî li salona xwaringehê civiyan. Ji derî van beşdaran ji Norvejê jî du mamosteyên kurdên ku bi eslê xwe ji kurdên Anatoliya Navîn bûn wek mêvan beşdar bûn.

Mamosteyê kurd Mehmet Balta bi axaftineke kurt programê vekir weha dewam kir:

"Hûn hemû bi xêr hatin Newrozê û Newroza we pîroz be! Îro newroz e. Newroz sersal e. Newroz destpêka biharê ye. Wek hûn jî dizanin di dibistanê de 111 zarokên kurd hene. Ji % 98 wan zarokên kurdên Anatoliyê ne. Ew kurdên Anatoliyê ne ku li welatên bîyanî bi sedsalan bi zimanên xwe deng kirine, xwedî li ziman û kultura xwe derketine û li vir jî weha dikin yani bi zimanê xwe deng dikin. Wek zarokên din ew jî gulek ji gulên cîhanê ne. Ji bo pêşeroja xwe û mirovatiyê em bi hêvî ne. Em cîhaneke pak, bêşer, cihanek ku li ser axa wê hemû mirov û gel azad û welat serbixwe bin, hêvî dikin. Em hêvî dikin dê rojek zarokên me jî bi azadiya xwe û gelê xwe serbilind, bi serxwebûna welatê xwe şa bin.

Em bi van hêviyan Newroz û sersala we pîroz dikin!"

www.arsyaxurd.org

Piştî axaftina mamoste Mehmet Hakki Balta programê weha dom kir:

- Dengkirina rektorê dibistanê
- Helbest. -Ala me, Kurdistan xweş e.
- Govend, Koma Gulan
  (koma şagirdên dibistanê)
- Lîstoka Newrozê
  (bi PowerPointê hat nîşandan)
- Helbest
- Pêşbirika mast
- Koroya stranên me
  Koma şagirdên Tallidê
- Govend-Koma Gulan

Di dawiyê de ji aliyê dibistanê ve berfeşîr(dondirme) li zarokan hat belavkirin.

Piştî programê mamostên dibistanê li xwaringehê civiyan, xwarinên ku malbatên kurd ji bo wan anîbûn xwarin. Li ser pirsa kurd û Newrozê sohbetek kirin. Mamostên swêdî û kurd ji malbatên kurd re spasiyên xwe pêşkêş kirin.

Nivîs û wêne: Mehmet Hakki Balta



Li Fittjayê pîrozbahîya Newrozê

Şagirdên kurd ên beledîya Botkyrkayê (li Stockholmê) Newroza xwe di 17.03.2006an de li Fittjayê (Fitya) li dibistana ÄNGSSKOLANê bi şahîyeke mezin pîroz kir û nêzîkî 100 şagirdên kurd li gel mamosteyên xwe yên kurdî (Misto Birodirêj, Celal Sönmez, Nevin Baykal, Mehmet Bozan, Ekrem Altun û Mahmut Pakdemir) dê û bavên xwe di pîrozbahîya Newrozê de amade bûn.

Ji şagirdên dibistana bingehîn heta yên bi lîseyê beşdar bûn. Li gel kulîçe û şerbetan, şekirên cûbicûr jî li zarokan hat belav kirin. Zarokan li gel mamostên xwe, dê û bavan govend girtin. Di dawîyê de mamosteyan qelem û jêbir li hemû zarokan belav kirin.

Nivîs û wêne: M. Lewendî

www.sehidi.org

Muzaffer Özgür

Bi berpirsên komela KIRKPINARÊ A.Yaşar û Y. Güçlü re hevpeyivînek



Ahmet Yaşar Muzaffer Özgür û Yaşar Güçlü

Hûn dikarin xwe bi xwendevanên me bidin nasîn?

Ahmet Yaşar: Ez li gundê Kirkpinarê ku girêdayî yê Kuluyê ye, ji dayik bûme. Zewicî me û du zarokên min hene. Di dawiya dibistana yekemîn şûn da ji ber xizanbûna malbata min, min nekarî herim dibistanên din, min li Ankarayê dest bi kar kir. Di salen 1970da ketim nav sîyaseta Kurd û bi DDKD re aktiv kar kir. Di sala 1979an de hatim Almanyayê û li bajarê Kolnê, di komela me ya KKDKê de bi salan kar kir. Têkiliyên min bi însanan re pir baş bûn û ji ber wan kar û barên komelê bi tecrûbe bûm.

Yaşar Güçlü: Ez ji li gundê Kirkpinarê hatime dinê, zevici me û çar za-

www.arsivakadi.org



Besê û Gulten Akbina - Kırkpınar

rokên min hene. Di sala 1974an li gund min dibistana sereta û navîn û lîseyê jî di sala 1980î li Kuluyê xelas kir. Wê demê min di nav sîyaseta Kurd de cih girt. Pir êrîş hatin ser me û bavê min mecbûr ma ez anim Almanyê. Ez karker im û li kar berpirsiyarê sendikayê me. Ji bo kar û barê sendikayê min pir seminer û civinan de cih girt û xwedî tercûbe bûm.

Di destpekê de hûn dikarin gundê xwe bidin nasin?

– Gunde me Kirkpinar-Celikan girêdayîyê Kuluyê ye. Em reşî ne û ji eşîra Celikan in. Kal û pîrên me ji Kurdistanê hatine vir û ji sedsalî zêdetir in ku me li vir cih girtiye. Bi rasti diroka me bi riya Bîrnebûnê hat zelal kirin. Li gund, Kulu, Ankarê gundiyên me dijin. Gundiyên me li dewletên wek Danimarka, Almanya, Hollanda, Avusturya, Finland, Swêd, Swisre, Avusturya, Kanada belav bûne. Ji bo geş û germkirina têkiliyên nav gundiyên me komele avakirin gelek hewce ye.

Çima navê komela we ne bi kurdî ye?

– Çend sedemên wê hene ku me navê tirkî hilbijart.

- Ji bo kêmasiyên qanûnên Tirkiyê
- Meriyên li gund dijin ji bo astengiyan naxwazin
- Jiyana li Kirkpinarê ya feodal
- Ji bo gumana siyasi ya gundiyên me.

Di nav gundîyên we de fikre komeleavakirinê çawa hat holê, karûbarên we çawa dimeşin?

www.arsivakurdi.org



Sultan Akbina - Kırkpınar

– Hûn ji dizanin li Hollanda malpereka me heye. Hevalê ku bi peran ve mijûl dibe karûbarên gund, rewşa gund û xeber li ser malperê agahdarî didan gundiyên me yên li Ewrupa. Li ser karûbarên ciwanên me yên li dor aliye bajarê Kolnê dîtinên şeva kulturî çêkirin, hat holê. Di 2004an de me şev çekir û 400 kesên me yên li Ewrupa dijîn beşdar bûn. Bi rastî karûbarên ku ciwanên me kirin pir hêja bû.

Şeva Kolnê ji bo karûbarên me bû destpekeke baş. Di şevê de ji bo komel avakirinê agahdari hat dayîn û gengeşî çêbûn. Gundiyên me pozîtîv bûn û alikariyê dan me. Me jî ji xwe re kir armanc ku em karê xwe li hemû welatên ku gundiyên me lê dijîn çêbikin û rêxistineke ava bikin. Cara yekem bi hemû beşdarên welatên Ewrupa di 18.4.2005an de me komiteke bi navê Kirkpinar-Celikan ava kir.

Paşê bi navê Kirkpinar li Hollanda me komelekê ava kir. Li Danemerk jî komitekê çêbû. Ji bo karûbarên me yê Ewrupa cih bigire me biryar da ku em li Tirkiyê, li gund komeleke ava bikin. Ji bo têkilî û amadekirinê me her duyan wezîfe girtin ser xwe. Di destpekê de, me bi serokê belediyê, muhtaran, bi mezinên gund û xortan re têkilî danî, lê bi awayekî germ lê mêzenekirin. Dema tu dibêjî em ê komelekê ava bikin, însanên me dûr radiwestin, dikevin gumana sîyasetê. Gundiyên me digotin, belediya me heye, gerek tuneye ku komelek ava bikin. Lê me biryar girtibû ku em ê rewşa gundê me ye di nav feodaliyê de nemeyinî û karûbarên xwe berdewam bikin. Me di şeş mehan de çend gundiyên xwe îkna kirin û bi serokatiya birêz mamoste Hizir Akbîna komela xwe ava kir.

– Heta niha we çi kar kir û di pêşerojê de hûn dixwazin çi bikin?

Di sala 2004an de me destpêkir ku em ji her malbatê 100 Euro alikarî bigirin. Di destpêkê de me dibistana gund temîr kir. Kêmasiyên wan temam kirin. Komita me ya Ewrupa biryar da ku em bi alikariyên sala 2004 û 2005an pirsa ava gund xelas bikin. Bi alikariya belediya me û komela me bi 96 YTL. Hatin mesref kirin û pirsa avê teva bû. Em bi sîstemeke baş civinên xwe berdewam dikin. Heta niha me du şevên kulturî çêkirin a sêyemîn di 22.04.2006an de li Danemerkê, li bajarê Kopenhagenê

www.arsivakurdi.org

ye. Ji bo pêşerojê ji çend projên me hene. Eger îmkanên me hebin daxwaz pir in.

Kêmasiyên saha futbolê ya gund temam kirine. Ji bo malbatan parkek were çêkirin. Li gund proja dardanînê, avakirina pirtûkxaneyek.

Birêzan, Kurdên Anatoliya Navin li Almanya pir zêde ne, bi taybetî ji li dorûbera bajarê Kolnê. Gundên din jî komelên xwe hene, hûn nikarin ji bo zarokên xwe, heqên xwe, ziman û kultura xwe bi hev re kar bikin?

– Erê, kurdên me hene. Em ji bo tevkarkirinê amade ne. Lê divê em tecrûbeyên xwe, ji bîr nekin. Eger pêşniyazek were em ê li ser rawestin. Ziman û kultura me pir bindest maye, paşta maye. Em ê piştgiriyê bidin. Em di bin tesîra kesekî de namenin û naxwazin kes me bike bin tesîra xwe. Ev meseleyeke girîng e, karûbar bi dostanî û baweriye tê meşandin.

Ji bo komelê hûn piştgirî û destekeke baş ji gundiyên xwe digrin an na?

– Di destpekê de gundiyên me bi awayekî germ li karê me mêze nekirin. Niha hin baştir bû. Hemû gundî alikariyê didin me. Ji bo karûbarê me hin ji têrnake. Li welatên Ewrupa 440 malbatên me dijîn heta niha em gehiştine ji % 80. Armanca me bigehêjin ji %100. Li gund jî armanc ev e.

Di civin û şahiyên komelê de hûn bi kîjan zimanî deng dikin?

– Em di civînên xwe de bi kurdiya aliyê xwe deng dikin. Di şahiya de tirkî tê deng kirin lê kurmancîya me jî her tim li kêleka tirkî ye. Em civateke duzimanî ne.

Li NRW gundiyên Kirkpinarê pir in. Hûn nikarin kursên zimanê dayikê -kurdî- ji bo zarokên xwe organize bikin, li wî welatî alikarî jî tê dayîn an na?

– Erê, ji berê ve kar weng hatiye kirin. Em yan ji çend kom û komele bi tenê nikarin vî karî bikin. Dema berê ji hemû grûp û komelan tevhev kar nekirin û karên kurdan baş nemeşiya û negiheştin armancên xwe. Eger piştgiriya me pêwîst be, em ê bikin. Lê di destpekê de divê em li ser deng bikin.

Di dawîye de hûn dixwazin çi bejin, mesajek we heye?

– Em dizanin ku gundiyên aliyê me jî karûbarên weng dikin. Di navbera me de pêkanîna têkiliyên xurt, armanca me ye. Em ji bo têkiliyên demokratîk û vekirî amade ne. Xwestina me ji wan ev e. Li dawiye; ji bo karûbarên Bîrnebûnê em spasiya we dikin, hûn karekî gelek hêja dikin, em we pîroz dikin. Di çend hejmaran de li ser karûbarên me agahdarî û nûçe hatin çapkirin, spas ji we re. Em bi riya Bîrnebûnê ji hemû kurdan re û bi taybetî ji kurdên Anatoliya Navîn re silavên xwe yên germ dişênin.

* Hevpeyvin bi zimanê tirkî hatiye kirin û me wergerand kurdî.

www.arsivakurd.org

Uskê Cimik

Li ser pirsa kurd li Tirkiyê û YE bi Nebî Kesen re hevpeyvînek

Hûn dikarin xwe ji me re bidin nasandin.?

– Ez di sala 1962an de, li gundê Încovê hatim dinê. Heta 18 salîya xwe li gund bûm û li wir lîse xilas kir. Di 1980î de hatim Elmanya û heta niha jî li vir dijîm. Dawîya universîteyê (beşê aborî) karên asîstanî li universîtê û doçendê dibistanên prîvat kir. Îro ez xebata xwe ya meslekî wek pisporê baç (tirkî mali müşavir) berdewam dikim. Min di sala 1977an de tevgera kurd nas kir û ji wê demê li gor şertên xwe di navda me.



Di derheqa Pirsa kurd de hûn helwesta dewleta Tirkîye çawa dibînin?

– Pirsgirêka kurd li Tirkîyê, di çarcovaya îdeolojîya resmî hatîye tespît kirin. Gor vê îdeolojîyê ku navê wê Kemalîzm e hemû hemwelatiyên dewleta Tirkîyê "tirk" in. Yanê, netewê kurd 83 sal in ku ji alîyê îdeolojîya dewletê ve hatîyê înkar kirin. Qanûna bingehî ya Tirkîyê û sîstema sîyasî qet tu caran ji bona statûya kurdan nehat guhertin. Mîrov dikare bêjê, di vî warîde Tirkîyê li dinê nimûneyek e ku netewek 40 mîlyon hîn nabîne yan jî qebûl nake.

Armanca dewleta tirk, di dema avakirina Komara Tirkîyê de, ew bû ku, kurd bên asîmîle û "tirkkirin". Bi navê "yek dewlet, yek netew, yek al" qetlîe-

www.arsivakurd.org

mek li ser nasnameya kurd hatîye pêk anîn. Lê, kurdan ji pêşta ew sîyaseta înkar û asîmîle qebûl nekirin. Kurdan heta niha 29 caran serîhildan û xwedî li nasname û mafên xwe derketine. Ji bona vê di rojeva Tirkîyê de pirsgirêka kurd di rêza yekemîn de ye.

Di hundurê dewletê de hinek grûb (hikûmet, çend kesên ji birokrasî û îdare) êdî nabêjin "kurd tun in", lê bê konseptên yan jî ji tirsa xwe perspektîvên çareserkirina vê pirsê eşkere nakin. Di pirsgirêka kurd de gotinên dewleta kûr ku ordî û birokratên kemalîst di nav de ne, derbas dibin. Ew jî, tradîsyona îdeolojîya resmî berdewam dikin û bi argûmena "prensibên komarê" yan ji "natînalîzma Atatürk" nasnameya kurd red dikin. Heta ku dewleta kûr ji holî ranebe û rolê ordîyê di sîstema sîyasî de wenda nebe, statûya gelê kurd neye guhertin, astengiya herî mezin ev e.

Ji alîyê sîyaseta kurd a Tirkîyê pir navekok hene. Li vîr dikarin sê faktor bên ziman. Yekemîn: Kurdan bi tekoşîn û xebatên pirşiklî wek netew li dinê û li Tirkîyê xwe nişan dan û ketin rojevê. Raya gştî ya Tirkîyê (rêxistinên mafên mîrovan û civaka sîvîl, medya û ronakbirên tirk hwd.) êdi kurdan qebûl dikin. Sîyaseta dewletê li ser inkar û qetlkirina nasnameya kurd îro tû tişt îfade nake, ango bê mane ye. Duyemîn: Tirkîye ji sala 1964an vir de dixwaze bibe endamê Yekitîya Ewropa (YE). Şertên endametîyê (demoqrasî, dewleta hiqûq, parastina maf û azadîyên mirov, mafên kêmnetewan hwd.) bi pirsgirêka kurd ve girêdayî ye. Ji alîyê din, organ û sîyasetmedarên YE pir salan vir de behsa mafên kurdan dikin û bala Tirkîyê dikşînin ser vê pirsê. Di prosesa danûstandinan de pirsgirêka kurd divê bikeve rojevê. Ji bona îstîqrara sîyasî û aborî ya Tirkîyê pêwîst e ku kurd xwedî mafên xwe yên çarenûsî bibin û di navbera tirk û kurdan de "îhtîlaf" çê nebe. Bi kurtî, rêya endametîya YE di çareserkirina pirsgirêka kurd de derbas dibe. Sêyemên: Beşek Kurdistan êdî azad e û bûye dewleteke "cîranê" Komara Tirkîyê. Pêvajoyên li Kurdistana Başûr ji alîyê pir tiştan ve tesîreke mezin li ser sîyaseta kurd a Tirkîyê dike. Azad û dewletbûna Başûr rola kevrê domîno lîst. Di salên 2002-2005an de ordî û Kemalistan xwestin ku êrişeke eskerî li Kurdistana Başûr pêk bînin, lê kurdan û aktorên siyaseta nawnetewî (Dewletên Yekitî yên Amerika, DYA, YE hwd.) ev plan vala xwist in. Niha sîyaseta "Bakûrê Irak" ya Tirkîyê hat guhertin. Mehên dawî, têkilîyên resmî û "cîranî" bi kurdên Başûr re ket rojeva hikûmet û hêzên din yên dewleta Tirkîyê. Wek tê zanîn, nêzikî 300 şirketên tirk li herema Kurdistana Başûr bi învestitisyonan dest pêkirin. Tirkîyê di salekî de 3 mîlyar dolar qezenc ji ticareta kurdên Başûr re dike. Berjewendiyên karsazên û aboriya Tirkîyê ji bo guhertîna siyaseta Tirkîyê faktoreke girîng bû. Maneya ev sîyaseta nû ji bo pirsgirêka kurd di hindurê Tirkîyê de

www.arsivakurd.org

jî mezin e. Ji alîyekê, kurdên serbixwe mûhatab û "partner"ên Tirkîyê ne, ji alîyê din jî 20 milyon kurdên ku hemwelatên Tirkîyê ne, bê maf û statû ne. Ji vê mezintir nakokî heye?

Sîyaseta kurd a Tirkîyê pêşî sala 2006an ket merhaleyeke nû. Tirkîyê êdi mecbûr e ku statûyeke hiqûqî bide nasnameya kurd. Divê kurd di vî warî de xebat bikin, bi konsept û pêşniyazên xwe tesîrê li ser dewlet û raya giştî kûr bikin. Şaşîtî û feqên dewletê pir in û divê bên dîtin. Niqaşa li ser "nasnameya jorin û jîr" eşkere dike ku dewlet kurd û tirkan wekhev nabîne. Dîsa, mafên çandî wek kurdî di televîz yon û radyoda, kursên zimanê kurdî ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd bes nîne. Daxwazên kurdan wek qedera xwe tayînkirin û mafên wekhevî divê ji aliyên hemû rêxistin û hêzên kurdan ve bên gotin û parastin.

Mana wê belgeya muzakera ji bo Tirkiyê/ tirkan çi ye?

– Wek tê zanîn, Tirkîyê ji 40 salan vir di rêya endametîyê de ye. YE, di sala 1999an de ji bo Tirkîyê biryarek li ser statûya berendametî derxist. Şertên ku Tirkîyê ji bona destpêkirina danûstandinan bîne cih, bi navê "Kriterên Kopenhagê" tên ziman. Di dawîya sala 2004an de serokên dewlet û hikumetên endamên YE gaveke din avêtin û gotin, di meha çiriya pêşîn ya 2005an de divê danûstandin dest pêkin. Komîsyona YE ji bo çarçoveya danûstandinan raporeke amade kir û pêşnîyazên xwe rêz kirin. Di wê navberê de jî "Rapora Pêşveçûn ya 2005 an" temam bû. Bingehên biryara Konseya YE li ser destpêkirina muzakereyan ew du dokûment bûn.

Naveroka prosesa danûstandinan amadekirina Tirkîyê ji bo endametîyê ye. Yanê, Tirkîyê ji alîyê huqûq, aborî, civakî û siyasî mecbûr e ku standard û rewşên dewletên YE bigire. Ji bona vî YE konseptek nû ji bo Tirkîyê amade kir, çima ku ev dewlet ji YE pir dûr e. Berê her tiştî demokrasî, dewleta huquqî û kriterên din li Tirkîyê kêm hatîne cih. Belgeya çarçoveya danûstandinan tenê bi destê YE hat çêkirin û armanc, şert û rêyên prosesa nêzikbûnê (entegrasyonê) tê da hene. Di vir de 35 beş (hiqûq, civat, abori û hwd.) hatîne tespit kirin û di deh yan jî pazdeh salan de dê bibin navoreka danûstandinan.

Çarçoveya danûstandinan li gor huqûq û sîyaseta YE û daxwazên wê pêkhat û ji bo endametîya Tirkîyê esas e. Bi gotinek din, Tirkîyê nikare êdi şertên xwe bide pêş, yê ku bibe endam ew e. Gav bi gav sistema Tirkîyê ya huqûq, aborî û sîyasî divê bê guhertin. Dema ku Tirkîyê di pêvajoya danûstandinan de "probleman" derxe, mafê YE heye ku danûstandinan biqedîne yan jî bêne rawestandin. Şansên heyeta û dewleta tirk di warê danûstandinan de pir kêm in, di hinek beşan de qet tune. Wezifeya Tirkîyê ew e ku sîstema huqûqa ya YE tatbîq bike û raporên xwe bide.

www.arsivakurdi.org

Mafê kurdan li wê belgeya muzekere cih girtîne?

–Dokûmenta li ser çarçovaya danûstandinan kurt û di wê da ji alîyên pirsên û problemên prosesa nêzikbûna Tirkîyê ya Ewropa pir tişt negirtîye. Li derekî behsa demokrasî, dewleta huqûqî û mafên mirov dibe. Lê pirsgirêka kurd û mafên kêmnetewan di dokûmentê de cih negirtine. Sê sernivîs weha ne:

1. Prensibên danûstandinan
2. Navoreka danûstandinan
3. Metoda danûstandinan

Di raporên Komîsyona YE de pirî caran bi veşartî behsa pirsgirêka kurd tê kirin, lê, ji bo çaraserkirinê konseptekê YE hîn tune. Parlamentoya Ewropa li ser rewşa kurdan û sîyaseta Tirkîyê di vî warê de ji sala 1980ê vir de pirî caran niqaş kir û biryar derxist. Ev babet hêdî hêdi ji alîyê sîyasetmedarên dewletên YE jî bi eşkere tê gotin. Berpirsiyarên YE di salên dawî de bala Tirkîyê li ser çareserkirina vê "konflîktê" kişandin û rexne li îdeolojîya resmî (Kemalîzm) kirin.

Ji bo kurdan aspektek (an jî babetek) girîng di belgeya danûstendinan de cih girtîyê. Dema ku Tirkîyê krîter û normên ewropayî nede berçav û demoqrasî, mafên mirov û kêmnetewan tatbîq neke, wê demê danûstandin nikarin bên berdewamkirin. Yek tiştek din ku di çarçoveya danûstandin de cih girtîye, ew e ku Tirkîyê bi dewletên ciranê xwe re mecbûr e têkilîyan dayne û sîyaseteke aştîyane û bi îstîqrar bidomîne. Ji bona vê dewlet û ordîya Tirkîyê nikarin şerekî dijî Kurdistana Başûr destpêkin. Têkilîyên di navbena Tirkîyê û YE de ji alîyê niqaşa li ser kurdan û çareserkirineke aştîyane roleke mezin dilîze û dê di dema pêşta de jî bilîze.

Kurdan di berî 3ê çiriya pêşin dengê xwe gihandin cîhanê?

– Tevgera kurd salên dawî kar û xebatên hêja ji alîyê YE kirin. Partî, rêxistin û şexsiyetên me bala YE kişandin û daxwazên kurdan dan naskirin. Lê, kurd wek teref ji alîyê YE nayên qebûl kirin. Loma tesîra kurdan li ser têkilîyên duteref (YE û Tirkîyê) dîrekt nabe.

Problemeke mezin ev e ku di navbêna hêzên kurd de yekîtî tune û daxwazên kurdan bi dengekî netewî nayê gotin. Yanê, otorîteyeke netewî ji bo qebûlkirina kurdan ji alîyê YE şertê yekemin e. Astengîyek din jî heye ku kurd li ser YE (sîyaset, huqûq û aborî) hîn nezan in û di pêvajoya têkilîyên YE û Tirkîyê de bê konseptên fireh û kur dixebitin. Karên sîyasî û diplomasî ya kurdan ji alîye YE bi navên partî û rêxistinan pêk hatin û ne bes in. Ji alîyê din tevgera kurd ne xwedî perspektîv û projeyên dûr û dirêj in. Pirî caran kar û xebatên kurdan li ser YE, Tirkîyê û pirsgirêka kurd li gor rojevê pêk tên. Bi gotinek din, kurd li gor stratejîyeke bi bingeh û program gavan navên, rolê xwe wek ak-

www.arsivakurd.org



Ji civîna li ser YE û kurd li Stockholmê

torekî teref nalîzin. Kêmasîya tevgere kurd yek jî nebûna expertan e. Enstîtû û îlmdarên kurd alîkarîyê partî û rêxistinan ji alîyê vî babetê nakin yan jî kêm dikin. Tevgera kurd jî ji kurdên zana û pispor nikarin îstîfade bikin.

Ev sedemên ku li jor hatin gotin di têkilîyên kurdan û YE de tesireke pir mezin dikin. Herdû biryarên YE li sala 2004 û 2005an şanseke mezin da ber kurdan. Lê, wan ji wê pêvajoyê istîfade nekirin. Komîsyona YE "Rapora Pêşveçûna 2005an" weşand, qet partî û medya kurdan behsa wê nekir, çima ku ew rapor bi ingilîzî bû û bi tirkî nehat wergerandin. Ev tiştek taybetîye ku xebera kurdan ji wan pêvajoyan nabe. Lewra, divê kurd di kar û xebatên li ser tekilîyên YE û Tirkîyê de sîstematîk û bi istîqrarî gavan bavên.

Ji kurdan re hêvîyeke an ne?

– Berî her tiştî divê bêzanîn ku kurd maf û azadîyan tenê bi karên xwe dikarin bi dest bixin. Pêwist e, hêz û faktorên nawnetewî (YE, YDA û Kurdistana Başûr) jî roleke pozitîf di vî warî de bilîzin. Lê, kar û konseptên kurdên Bakûr esasî ne. Pêvajoyên di hundurî Tirkîyê de (niqaşa li ser pirsgirêka kurd, demokrasî, maf û azadîyên mirov û kêmnetewan) bi têkilîyen YE û Tirkîyê re êdî girêdayîne. Kurd dikarin ji her alî mudaxeleya rojevê bikin û daxwazên xwe nas û qebûl kirin bidin. Belê, sistema Tirkîyê (dewleta kûr, ordî, hêzên kemalîst û nasyo-

www.arsivakurd.org

nalîst) hin ji bo qebûl û îcrakirina daxwazên kurdan pir dûr in. Divê kurd û hêzên demokrat yên Tirkîyê dijî vî sîstemê bi hev re kar bikin û biguherin.

Prosesa danûstandinan ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd girîng e. Lê ev nayê wê maneyê ku, tenê danûstandin dê çareserkirinê bîne. Rastîyek heye ku Tirkîye di dema danûstandinan de rewşa xwe bi temamî entegre ya YE ê bike. Rêya endametîyê dirêj e û pir rizikoyan re girêdayî ye. Bê çareserkirina pirsgirêka kurd Tirkîyê nikarê şertên endametîyên sîyasî, aborî û civakî bîne cih. Guherandinên huqûqî li Tirkîyê bi xwe re maf û azadîyên mirov û kêmnetewan fireh dike. Ev jî, ji bo kurdan tiştekî pozîtîf e.

Çi rol dê danûstandin li ser çareserkirina pirsgirêka kurd bi temamî bilîze, hîn ne eşkere ye. Pir faktorên hundurî (guherandinên Tirkîyê, niqaşa li ser pirsgirêka kurd, quweta tevgera kurd û yekitîya wê) û derwayî (rolê DYA, siyaseta kurd ya YE, dewletbûna Kurdistana Başûr, rewşa Kurdistana Rojhilat hwd.) di vir de cih digrin. Bi rastî, Tirkîyê êdi mecbûr e û dikeve ser rêya çareserkirinê. Mimkûn e danûstandin bibin "wesile" û vê rêyê vekin. Hinek generalên tirk yên berî qebûl dikin ku endametî ya YE ji bo parastina Komara Tirkîyê garantîyeke mezin e.

Eger Tirkiye ji YE dûr bikeve, qetandina Kurdistana Bakûr ji Tirkîyê bikeve rojevê. Wek tenê alternatîv federasyoneke kurd û tirkan di hundurî Tirkîyê de maye. Ev babet ji alîyê YE û Tirkîyê ve jî tê zanîn. Bona vî nêzikbûna Tirkîyê ya YE ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd bi şiklê federasyon girîng e. Menfatên kurdan yên aborî, çandî û civakî di nêzikbûna YE de ye. Ji alîyê menfatên sîyasî yên kurdan (qedera xwe tayinkirin û wekhevî ya kurdan û tirkan) ev pirs bi şiklê çareserkirinê ve girêdayî ye.

Destpêkirina danûstandinan ji bo kurdan baş e û rêyeke nû vekir. Niha, tevgere kurd dikare bi pêşnîyaz, konsept û alternatîfan tesîra xwe bimînin. Ne tenê kurdên Bakûr, hikûmeta Kurdistana Başur jî, divê xwedî siyaset û programa ji bo çareserkirina pirsgrêka kurd li Tirkîyê be. Di navbena YE û îdareya Kurdistana Başûr de têkilîyên duteref pêwist in. Yê tesîra xwe li ser vê babetê bike. Pirsgirêka kurd pirseke nawnetewî ye û terefin vî îhtîlafî yek jî YE ye. Di çarçoveya dîyalog û hevkarî de şansên çareserkirinê mezin dibin. Kurdên Bakur, hikumeta Başûr, DYA, YE û dewletên YE dikarin ji pir alîyan ve zorê bidin Tirkîyê. Gavên çareserkirinê di rêya danûstandinan de mimkûn in. Lê garantîyên wê tunene. Divê tevgere kurd kar û têkilîyên xwe bidomîne û danûstandinan li gor menfatên kurdan biguhere.

Rîzîkoyeke mezin ji bo kurdan ev e ku di prosesa danûstandinan de mafên gelê kurd wek mafên kêmnetewî bên fam û îcra kirin. Belê, mafên kêmnetewî bo kurdan jî girîng in û divê ew ji îstîfade bikin. Lê, çareserki-

www.arsivakurd.org

rina pirsgrêka kurd xwebirêvebirinê (ingilizî: self-determination) û wekhevî dixwaze, ku şiklê van prensîban federasyon e. Entegrasyon û endametîya Tirkîye ya YE û sîstemeke federatîf bi hevre mimkûn e û divê daxwaza kurdan be.

Di vê dema dirêj de kurd dikarin çi bikin?

– Di destê kurdan de pir îmkan û metod hene ku ew daxwazên xwe bilind bikin. Wezîfeya yekemîn divê sensibîlîzekirina raya giştî ya kurd be. Partî, rêxistin û şexsiyetên siyasetmedar, nivîskar, lêkolinêr û hunermend dikarin prosesa danûstandinan teqip bikin û di vî warî de xwedî înformasyonê bin. Ji alîyê organên YE mimkûn e ku ev înformasyon bên girtin. Li gor pêşveçûyan herdem bêşnîyaz û konsepten kurdan divê hebin. Ji bona vî zanayî û organîzebûn pêwîst in. Nimûneyek: zimanzan û pedagogên kurd dikarin di bin sername ya "YE-Tirkîyê û pirsên pêywendî ya kurdan" grûbeke çêkin û pêşnîyazên xwe li ser vî babetê bihevgînin û bidin berpirsiyarên YE.

Kurdên li dewletên Ewropa potansîyeleke mezin in. Hejmara kurdên Ewropa nêzikî 1,5 milyon e. Piraniya wan hemwelatên YEê ne û xwedî îmkan in. Bi dehan rêxistin, înstîtû û inîsyatîf hene. Tenê ji alîyê mafên kurdên li dewletên YE de pêwîst e ku diyalog û komûnîkasyona wan çêbe û konsept bên amadekirin. Mixabin, li gor hejmara kurdên Ewropa dengê wan pir sist e û di karê dîplomasî de kêmasîyên mezin tên dîtin.

Çend pêşnîyazên ku li vir bên ziman ev in:

1. Ji aliyê têkilîyên YE û Tirkîyê rexis–tin an ji grûbeke kordinasyonê divê çêbe. Înstîtûya Kurd ya Parîs an jî Brûkselê dikare serê vî karê bikşîne. Di vî rêxistin an jî grûbê de mecbûre ku kurdên zana û pispor hebin.

2. Di navbena hemû partî, rêxistin û şexsiyetan de konsensûsek ji aliyê daxwazên kurdan hebe ku YE û berpirsîyarên wê di prosesa danûstandinan de mafên kurdan jî bidin berçav û daxin rojevê. Konsensûs çawa çê bibe? Divê konferansek kurdan tenê li ser vî mijarê bê amadekirin. Di konferansê de hemû partî, rêxistin û înstîtûyên kurd dikarin wek beşdar dîtin û konseptên xwe bêjin. Pêwîst e ku serokên beledîyên li Kurdistanê di konferensê de cih bigrin. Îlmdar û pisporên kurd ku di konferensê de beşdar bin, divê "Programa Netewî ya kurdan ji alîyê endematîya Tirkîyê ya YE" amade û pêşnîyaz bikin. Di vî warî de kurd, bi rastî, dereng man. Berpirsîyarên YE hîn jî nizanin, "kurd çi dixwazin".

3. Di çarçoveya danûstandinan de 35 beş hatine tespît kirin. Kijan beş bi menfat û hewceyên kurdan re giredayî ye divê bên zanîn. Li gora vî dikarin pêşnîyazên kurdan analîz û tespît bikin. Di navbena YE û Tirkîyê de muzakere

www.ersivakurdi.org

yên li ser beşan 6-9 meh ê berdewam dikin. Divê kurd van pêvajoyan teqîp bikin û berê xilasbûna her muzekereyekî xwedi pêşniyaz bin. Bi îmkanên sîyasî, dîplomasî, medya hwd. divê kurd daxwazên xwe bidin qebûlkirin ku encamên tek tek danûstandinan li gor xwestina kurdan be. Ev karekê bi zehmet û dirêj e, loma ev grûba ku li jor hat gotin rola xwe bilîze. Raya giştî ya kurd, ya YE û ya Tirkîyê divê ji alîyê kar, daxwaz û pêşniyazên kurdan ve herdem bê sembolîze û tespît kirin.

4. Medya kurd divê pozisyonên kurdan ji alîyê YE di rojevê de bigre. Pir pêwîst e ku muneqeşe û lêkolînên li ser vî babetê berdewamkin û bi şikleke dînamîk dikevin rojeva YE û Tirkîyê. Medya di hundurî YE de jî di vir de dikare roleke mezin bilîhîze. Nivîs, lêkolîn û daxuyanîyên kurd divê bi zimanên din yên ewropayî jî bên çap û belav kirin.

Li Anatolîya Navîn bi sedan salan in ku nêzikî mîlyonek kurd hene, kurdên Anatoliya Navin bo tercîhên xwe yên sîyasî divê li ser kîjan krîterên bingehîn bifikirin?

–Rewşa kurdên Anatolîyê li gor kurdên din pir cuda ye. Du kriterên wan yên mezin hene: Yekemîn: Kurdên Anatolîyê grûbeke kêmnetew in û bi temamî li heremekê cih girtine (ingilizî: otokton). Ew ne tenê bi statûya hemwelatî bi Tirkîyê re giredayîne, ew direkt di nav gelê Tirk de dijîn. Bi gotinek din, kurdên Anatoliyê "Tirkîyêyî" ne. Dûwemin: Kurdên Anatolîyê ji alîye tarix, ziman û çand beşek Netewa kurd in. Ew ji bo civata kurd dewlemendîyek giring in û di bin tesîra pevajoyên li her çar parçeyên Kurdistanê dane.

Ji alîyê jîyana civakî û aborî, tesira sistema Tirkîyê li ser kurdên Anatolîyê bi piranî cih girtîyê. Ji alîyê din, siyaset û çanda kurdên Kurdistan di bîst salên dawî da kurdên Anatolîyê jî kir bin tesîra xwe. Herdû faktor kurdên Anatolîyê digûherin û dibin sebebên "navekokan". Ji bo jîyana aborî û civakî harmonîyek di navbena tirkan û kurdên Anatolîyê da mecbûr e. Menfatên herdû gruban bi hevra girêdayî ne û divê ûsa jî berdewam ke. Ji alîyê siyaset û çand de problem an jî navekok hene.

Yek problem ewe ku kurdên Anatolîyê di sistema asîmîlasyonê de ziman û çanda xwe vinda dikin, çima ku di dibistanan da zimanê kurdî nayê hînkirin. Neslên ciwan û zarok hêdi hêdi ziman û çanda xwe bîr dikin û dibin "tirk". Divê kurdên Anatolîyê ji bo parastina nasnameya xwe ya kurd çareyan bigerin û pêkbênin.

Problemek din jî bi pirsgrêka kurd ra direk girêdayî ye. Azadîya gelê kurd babetek kurdên Anatoliyê jî û heyecanek mezin dide wan. Pirsgirêka kurd êdi hemû kurdên dinê eleke dike. Tercîhên kurdên Anatolîyê di vî "îhtilafê" da eşkereye. Dilê kurdên Anatolîyê bi kurdên Kurdis-

www.arsivakurdi.org

tanê ra ye. Ji bona vî, kurdên me divê siyaseteke mêzîn (ingilîzî: balance) bajon. Ew tê vî manayê ku kurdên Anatolîyê divê ji aliyêkî tirkan wek cîran û hevkar bibînin, ji alîyê din jî têkilîyên xwe bi kurdên Kurdistanê û le herderî dinê ra çêkin. Alikarîya tekoşîna netewa kurd ji bo menfatên kurden Anatolîye jî. Naskirina nasnameya kurd û mafên çarenûsî ji Kurdên Anatolîyê ra pêwist in. Bi kurti, çareserkirina pirsgirêka kurd bi xwe ra avantajên mezin ji bo kurdên Anatolîyê yê bêne.

Kurden Anatolîya Navîn di pêvajoya YE de cihê wan û girîngîya wan çi ye? – Heta niha YE, bala xwe nekşand ser kurdên Anatolîyê. Lê, li ser kêmnetewan (hindikayîyan) niqaşek li Tirkîyê destpêkir û ev mijar ji bo kurdên Anatolîyê jî pirr giring e. Bi rastî, kurdên Anatolîyê yek kêmnetewek Tirkîyê ne û divê xwedî mafên kêmnetewan bin. Di siyaset û huqûqa YE da pirsên kêmnetewan cihek mezin digrin. Mimkûne ku di prosesa danûstandinan da problemên kurdên Anatolîyê jî dikeve rojevê.

Kurdên Anatolîyê heta iro tekilîyên YE û Tirkîyê teqip nekirin û ne xwedî konseptan in. Divê serokên beledîyên heremên kurd li Anatolîyê û siyasetmedar li ser vî babetê bisekinin û pêşniyaran bikin. Daxwazên kurdên Anatolîyê ji Tirkîyê hene? Yek ninûme: dersên zimanê kurdî di dibistanan da tê xwestin, divê eşkere be. Li ser parastina û pêşvekirina çanda kurdên Anatolîyê divê daxwazên wan hebin û bên formule kirin. Di vî warî de kêmasiyek an jî valahiyeke mezin heye.

Di salên dawî de pir malparên înternet yên kurdên Anatolîyê çêbûn û karekî baş berdewam dikin. Ji alîyê din êdi komelên herêmên kurdên Anatolîyê saz bûne. Kovarên wek Bîrnebûn û Veger xizmeteke mezin ji bo çanda kurdên Anatolîyê kirin. Van gavana pir girîng in û divê hêdî hêdi bi şiklê kordînasyon û hevkarî yekdengîyek li aliyê mafên kurdên Anatolîyê çêbe. Dema ku daxwazên kurdên Anatolîyê bûn, divê ev daxwaz ji bên îcra kirin. Têkilîyên YE û Tirkîyê bi vê manayê şansekê dide wan.

Sipas!

Xelkedondurma.com
Dengê Kurdên Anatolîya Navîn

www.arsivakurdi.org

Mem Xelîkan

ÇEND BIWÊJ Û ÇEND ÇÎROK

Ez çend rojan berê di înternetê de digerîyam, di malpara Xelikan de rastî pirsa xortekî hatim. Vî hevalî, daxwazeke xwe dikir. Digot; "Va Mişkê Bello çi ye. Bila hevalek binivsîne em jî bizanibin". Ew pirs gelek xweşa min çû. Di çanda her gelekî de; metelok, gotinên mezinan û biwêj hene. Her gelek, ji wan gotinan ders derdixe û ji wan par digire.

Di jîyana rojene de wan mînak dide. Bi wan mînakan çand û ziman dewlemend dibin. Li civatan ji, him şora merîyek wan di gotinên xwe de tîne ziman xweş dike, him ji guhdarên li cemeetê kêfxweş dikin. Bi wan biwêjan, li cemeetê sohbet xweş dibin û yaranî, henek jî çê dibin. Metelok û biwêjên kurdên Anatolîyê, di Bîrnebûnê de gelek hatin weşandin. Hê jî têne weşandin. Lê, divê meriv mane û hekatên wan baş bizane ku dema ew mînak dan bi şûn û war bîne zimên. Dema meriv wan tîne zimên, yê pota jî bişkêne û li nava cemeetê bikeve rewşeke neçê jî. Bi ser pirsa vî hevali, min dil heye ez çend hekatên wan biwêjên me ji we re binivsînim.

KÛÇIKÊ HESÎ COLO

Hesê Colo şivan bû. Kûçikekî vî yê binar hebûye. Te digot çiqasî binare, wiqasî binar bûye. Hesê, çiqas li berxwedidayê ew binara bi xwe re nedibirîye çolê. Hes difikire "Ez ê çi bikim çi nekim, vî binarî bibim çolê. Min û pêz, ji gur û dizan biparêze." Bi ser wê yekê de, Hesê me, her ro



www.arsivakurdi.org

ku pez ji fêzê radikirîye berîya xwe tiji nanê hûr dikirîye. Berê xwe daye çolê, serî her pênç – deh gava carekê parîyek nan avitîye ber kûçikê xwe. Kûçik her ku nan dixwarîye li dû Hesê çûyê. Lê, nan li kê derê xilas dibûyê, kûçikê binar Hes û pez li wir berdidayê û vedigerîyaye gund. Bi ser wê de kûçikê Hesê li herdê me bûye biwêjeke xweş û baş.



KERÊ QERE MISTIQ

Qere Mistiq berhev dikir. A ku hûn bizanin parsek bûye. Tim û tim li ser pişta kerê gund bi gund digerîyaye. Bi xêr û hesnetên ciwatê debara xwe û dayika xwe ya pîrik dikiriye. Çûyê malên axlera, li wir xwariye, vexwariye, çi dane wî kiriye têra xwe vegerîye gundê xwe. Havînê jî, li pişta kerê xerman bi xerman geryaye. Ceh û Genim çi dane wî, wan girtine. Rokê li cemeetekê, gotîye; " Ez, diherim ser xermane axlera, kerê xwe berdidim ser ceh û genimê wan. Kerê min ceh û genimê axlera naxwe, dihere li mal boçê şijingê dayîka min dixwe". Bi ser wê de, meriyekî li dereke bi heyî hewcedarîya xwe hal nekir, hat li derekê bi tuneyî li çareserîyekê gerî, jê re dibêjin " Erê canê min, Kerê Qerê Mistiq e, cêce axlera naxwe, boçê şijinga dixwe".

ÇÛÇIKA MALÊ EHMEDÎ MESTÊ

Çûçikeke Mala Ehmedê Mestê hebûyê. Çûçikê, xwarin û vexwarina xwe li xwedana bûye. Bi ro li derve, li nav mala gerîyayê. Bi şev hatîye xwedana û diketîyê pîna xwe. Lê, li nav malan jî hêk kirîye. Ji bo wê li cem me; merîyekî tu xêrê xwe bi xwedana tune be , li mal dike- dixwe, li şûna karê mala xwe dihere, karê xelkê dike, wê demê dibêjin " Çûçika Malê Ehmedî Mestê ye, li ba min e lê li nav malan jî hêke".

MIŞKÊ BELLO

Berê tuneyî bû. Zivistanê, nan û ard, bulxir (sawar) li malan teva dibû. Wê wextê, gundîyan; ceh û kaya pêz an jî tiştekî din, kêmayî yek wana bû diçûn ji cîran û hevalan kêmasîyan dên dikirin. Rojekê cîranekî Bello, dihere cem

www.arsivakurd.org

wî û jê re dibêje Husîn (navê vî yî rast Husîn bû); " Ku li cem te heye, çalek ard bide min. Nan ardê kurikan xilas bû, kurik li mal birçî ne".Bello, nabê na. Lê, ji cîranê xwe re ku bizane ard di mala Husîn de jî tune, çale êrdên di mala vî de jî yên valane, gotîye; " Wele, mişk dikevin mala me, yên bi enîyê li çalên êrd dikevine". Ev gotin jî, niha li erdê me biwêjek e. Merîyek , heger ji bo hewcedarîyekê çû derekê û dest vala vegerîya, em jê re dibêjin; " Bû Mişkê Bello, bi enîyê liket."

TIRI YÊ MELLO

Erebeke Mello ya hespa hebû. Gund bi gund digerî, tiri difirot. Li gundekî me jî xaltî ya Xec rûdinişt. Xaltîya Xecê pir xizan bû. Bi alîkarîya cîran û hevalan li ser linga bû. Rojek Remezanê, cîranekê wê dibîne ku Xaltîya Xecê rojiya xwe dixwe, rojîyê nagirê. Jê re dibêje; " Xaltîya Xecê; tu çima rojiyê nagirî? Tu mezinekî, li van salana ji te re nabe, guneh e." Xaltîya Xec gotiye; " Erê... erê ez qurban tu rast dibêjî lê; bi tiriyê Mello ne şev reş dibe, ne jî rojî tê girtinê".

DEVÊ ZÊD

Ji gundekî Qulekê du bira hespên xwe wenda dibin. Radibin li hespa digerin. Bi peyatî gund bi gund hetanî Xelikên jêr (Gölyazi) diherin. Hespan nabînin, lê him diwestin, him jî pir birçî dibin. Li perî gund, li derî malekê dixin, bermalîya malê tê der, jê re dibêjin: "Em ji felan gundî ne. Hal hekata xwe jê re kat dikin. Em, mîvanê Xwedê ne, em birçî ne." Xanima malê, wan dawetî hundir dike. Xwedîyê malê ji nav gund bi anîtin dide. Birayê mezin xwe daye alî jor odê, bi xwedîyê malê re sohbetê dike. Mêrê malê bangê xanima xwe dike; dibê: "Xanim, ji mîvana re zadekî bi ser êrde." Xanim derdikeve şun va ji mêvanan, birayê biçûk jî tevli sohbetê dibe. Xwedîyê malê, guh dide ser bira yê biçûk du re carek din banga bermalîya xwe dike. Dibê; " *Xanim were were, bila zad daweste, tu here berxekî serjêke, va deva ne devê zêd e*".

Çi bêjim nizam. Hekatên me û biwêjên me viqas xweş in. Meriv ew merivayê ku li cemeetekê deng kir, devê vî ne devê zêd be û kavirên nêr bi guna tenê nas neke.

Ziman hebûna me ye!

www.arsivakurdi.org

Nuh Ateş

Hindik û rindik

DENDÎK

Wê royê, yekî qala zeweşê zemanê berê tikir. Wengdigot: "..Tewêyî çi birango, berê li Xelika her tiştî bi tam û bereket wû...

Wextê xermana, em ê bi nîvro lı sîya selê sêp rûniştana, sê, çar mal me teve hev şîv û nanê bixara...

Me zeweşê biqelişta, rengî sur e, mîna xûnê ye, tê bêyî xûnê pi berfê va teve hev kirine....

De tu ware, ji birangê xe ra bêm, mê bixara, çima bi tam, wekî mit wû. Avê zêweş a bi devlêv û destên me da birijîya, tiliyên mê pê bi hev da binûskîna....

Ku zeweş teva dewû, vê carê me devlêv û tiliyên xê bialastana, me binî qalika birûçkanda, ew ê reqrût bikira...

Li ser paşî jî, em ê çexe ser dendikê zêweş biyana, me ew ê yek bi yek bixarana... Hundurê dendika tamake xê xaş hewû...

Taho, çi dunêke derewin e lo!!!

Niha her tiştî vê tam û tik e, bê xêr û bereket e!"

Min jî ew rona dîn. Tê bîra min, zerdelê darê malê İwikî Hecî Miçê ji tamê ne dihatin xarinê. Nihevsê yê xê têgihêştî yê mîna hengiv wûn. Ez jî tevê, xortê hîngê me xêr bi darê malê İwikê ne tikir, teçûn dizîya zerdela. Eşkun û İwikê xizan ti dest me da ketiwûn belê.

Me dendikê zerdala jî dixarin. Ê tahl ne, ê xê şîrîn bi me çiqas xaş tihatin. Ku te dixar şûn da, tameke lezîz li ser zimanê te tima.

Em bi dendikê zerdelan dılîstin jî. Her yekî ji me veqasî hev me dendik dikirin kortekê, paşê me pi dendikekî din, bi dorê li yê ti kortê da tixist. Yên ku te bi vî tonî ji kortê derxistî tewûn malê te.

Dendik binyat e, toxim e.. Zeweş jî dar jî vê dendik narûzin û bereketê nadin.

Di kurmancîya me da şorekê bi dendik heye. Li dere din heye, tune ez nizam, li Xelika dibên, " î dendika jê vi dertixê!" Ku yek ji heqê karekî derket, tam ji tiştekî derxist, hîngê yê vê şorê bên.

Mesela ku yekî serê govendê rind gerand, ê bên, " lê çir tikê lê, î dendika jê vi dertixê!"

Şorên me dine venge xaş pir in. Mesela " çîn jê vi derxistîn" yan jî "

www.arsivakurdi.org

çîn jê koz kirin!" Wextê ku yêk dikete rû yêkî din, ew rind xûlî tikir û ji rê vi dertixist, ê bigotina, " î çîna jê vi dertixê" yan jî " î çîna jê koz dike."

Ku me va şorina û yên din di çavê xe ra ne kirin, ku me ew dubara ne kirin û ne nivisîn, ew ê ji bîr biwin, com biwin herin. Ê com jî tewine.

Ziman dendikê kultura miletekî ye. Kultur bê ziman nawin.

Piçûk û mezin, em gî pi zimên tên şîretkirin û terbîyekirin. Di zimên da zanîn û tecrûbe veşartine.

Hustê kurmanciyê, Celadet Bedirxan loma gotiye, " ziman zanîn e, zanîn jî xwenasîn e !"

Jin û însan

Kî bû nizam, yekî qal kiribû. Li Xelika dohla (daweta) yekî hebûye. Ji Anqerê însanê gund bi tomofîla hatine dohlê. Ji tomafîla peya bûne, mêr li pêşîyê, ber bi mala dohlê çûne.

Xudanê dohlê bergindê çûye hêla malê û ji jinan re gotiye, "jinno, rawin, rê bidin însanê Anqerêyî tên !"

Ji însên qest, mêr in. Lê jin çi ne, ew ne insan in ?

Li daweta şûnê rind û rehet para mêra ye. Li odên rêxistî, bi mînder û balîv mêrê rûnin. Sifrê mezin li odê ya mêran e. Tiştî bi ser ra, şîv û xarinên bijartî para mêra in.

Lê jin li ku ne?

Wexte wan ya rûniştinê tune. Jinê xêrnedî yê qeramgiran in. Hezar kar û tahlî tim û tim li benda wan in. Çêkirina şîv û xarinên dohlê, şûştûna qawqacaxan li ser wan e...

Hasili jin ji îş û karan nagihên ku rûnin. Ku tenkê wexta wana bû jî, ew ê bîstkê li navberê aşxanê û pînê rûnin. Edetê berê weng wû, lê niha çing e?


Niha jî pir ne, tozkekê hatiye guhêrîn, jin li ser çardaxê rûtenine, lê hîn negihêştine odan.

Li şeva Xelika ya sala çûyî li Wîttenê, jin û mêrê Xelikan ji hev cihê, dûrî hevdu rûniştibûn. Va jî bi mîvanên yad neçê hat, wana va kire gilî.

Min mês kir ku ew ê vê ji me ra bikine serhevde. Min ji wan ra got, vê ji me ra mekin qusûr. İnsanê Xelikan xanda ye, moderin e. Jin û mêrê me her ro li mal li ber devî hev in. Siham, ew ê ji hev osan bûne û fersand va fersend e, ji hev dûr rûniştine. Va jî ne tu qusûr e. Bi rastî, jin ê kîngê wekî însan werin qebûl kirin?

www.arsivakurdi.org

Evîndar Can



Bîhna Reqiye

Qadir saf, Mille jî pir bi henek e. Rokê Qadir tere ba Mille. Mille dibê:

«Qadir ezî herme derekê weng telefon tên mês ke».

Mille tere ba cîranekî xwe û telefon dike ji Qadir ra. Dibê: «Tu kî yî, Mille heye?»

Qadir dibê: «Na, Mille tune ye, ew jî hîn nû derket, tu kî yî?»

Mille xwe ji wan derna nakê, dibê: Ez Elî me, ji Ewropê telefon dikime, tu kî bûyî?

Qadir dibê: «Oooo Elî tu yî? Tu çi dikî? Baş î? Ez Qadir im.»

Mille ji mêle Elî da lê dipirse dibê: «Mille ji min ra slav ke» û xatirê xwe jê dixwaze.

Paşê Mille te û dibê: «Qadir te çi kir, çi nekir?»

Qadir dibê: «Mille, tu çing çuyî Elî telefon kir.»

Mille dibê: «Na lo, ne Elî ye, qêy te rind nasnekirîyê!»

Elî li Ewropê bû û tim alkol vedixwaribû.

Qadir dibê: «Tu dîn î! Ez Elî nasnakime! Bîhna reqîyê jî ji dev dihat.»

Semûl tiji pez e

Kurdên Anatolîye ji Stenbole re dibên Semûl. Rokê Qadir ji bo firotina pez bi yekî re dihere Semûle, heta Semûle di erebe da di nav pez da bûye, heta Semûle ew di nav pez da bû û wî qet ti tişt nedîtibû, ew li Semûle peya dibe, li wir jî di nav pez da bû ye. Dema ku ew vedigere gund, gundîyên Xelika dibên «Qadir ji Semûle hatîye rabin em herin ba, ka ji me re qala çi bike, em pê bikenin». Ji ber ku li gundê Xelika ne tîyatro ne jî salona sînemakê heye, dîşliqê wan ne ye, zemanê çîroka jî

www.arsivakurd.org

derbasbû bû, ew dixwazin bikenin, ji Qêdir re dibên «Oooh! Tu hatî Qadir! Li Semûle çi heye, çi tune ye?» Qadir dibê «Semûl çi ye lo! Li wir tiştek tune, gîşk pez e!», millet gîşk pê dikene, qirfa dike û dibê « li wir însan qet tune ye? » Li ser ve Qadir dibê « min ne go li wir însan tune ye, min go însanê li wir jî gîşk mîna we yek pez in!».

Didane ecer

Qadir, li ba Hesen şivanîye dike, Hesen bi Qêdir re dibê „Tu hîn li vir î? Siheta pez hatîye, te çima hîn ranekirîye, rabe rabe dereng e!“. Qêdir jî didanê xwe ecer çêkiribûn, taqme kirêbûn, Qadir bi Hesen re dibê „Hesen te xwe şaş kirîye! Ez bi van didane ecer çing herim pez!“

Pavê gewrê pavê

Qadir qet hez nake here pez, lê ji tirse Hesen re ew dîsa jî tim dihere. Wexta ku ew li ber peze berf dibare, kêfek li Qêdir peyda dibe, pir xenê dibe bi berfe û dibê “Pavê gewre pavê! Pavê em pez bibin ser mal”.

Bes e sere me êşî

Yek ji Ewrope tê gund, bi xwe re kamerekê tîne, bi vê kamere fîlme Qêdir dikişîne. Qadir dibê:
”Bes e, lo! Çi me dikişînî! Ê serî me diêşîne!“.

Içecen gölgede yatacan

Qadir, li sîya xêni rûniştîye, yek bi Qêdir re dibê “Ezî herime bajêr, tiştinî bi lazim heye?”. Qadir dibê “Ji min re bîra bîne ez vexwim”. Hevalê wî dibê “Tu çi dizanî bîra vexwî, bira alkol e”. Li ba wan alkol, însanê modern vedixwe, li ba Qêdir jî modernizm bi tirkî deng kirin e, ew dibê “Ez çima nizanime vexwim, içeçen gölgede yatacan! ”

Bergîr yoldaş

Li wextekê li gundê Xelika bû mode, her kes bi hev re digo „heval“. Elî jî tim dikete rû Qêdir, digo „heval Qadir“, Qadir dibê „Em zatin hevalê hev in, tu çi bi min re tim dibê `heval`!“. Elî dibê „Ew ne mîna ku tu dizanî ye, yanî `yoldaş`e“. Qadir dibê „Yoldaş çi ye?“, Elî dibê „Yanî kesên ku bi rêya hev da diherin yoldaşe hev in“, Qadir dibê „Yanî em bi hespê me yî bergîr va yoldaşê hev in? Em bi wî va tim di rêkê da diherin.Yanî ez bi bergîr re bêm `bergîr yoldaş`?“

Bilatek bû!

Qêdîr pez anî mal, Hesen pez hemcirî(hejmirî) go „Qadir mîyek tune, te çir kir“, Qadir dibê „Ez çi dizanim!“, Hesen careke din dihemcire dibê „Eger te re lî kirîye, serjêkirîye û xwarîye bê ma ez lê negerim“, Qadir xwe ji wan derna nake, tim dibê „ez çi dizanim!“, Mille dizane bi çi şekile ji Qêdir derxîne, tê hêla Qêdir dibê „Ew mîya yekê jar e, goştê xwe hîşk e „ Qadir dibê „Erê lo, bilatek e, goştê xwe bê tam e“.

www.arsivakurdi.org

Bi kevçi, bi çetel?

Wexta ku li maleke xwarin hazir li ser sifre tê dîne û Qadir jî bi ser da were tu çi dikî bikî, bê Qadir „were bixwe“, ew naxwe, pir dixwaze bixwe lê înadeke wî heye, Mille ji ber ku Qêdir rind nas dike, alternatîva nake dudu, dibê „Qadir tu bi çetel bixwî, bi kevçi?“

Terle firotin çi zor bûye!

Qêdir terleke xwe hebû, wî da Elî, çû Tapû Qadastro ku tapûye li ser Elî derxîne, memûre Tapû Qadastro dibê, ma xwedanê terle bi tene were, Qadir dihere oda memûr, memûr ji Qêdir ra dibê “Tarlaniz tam olarak nerde, yerini tarif edebilir misiniz?” Qadir, bi Tirkî nizane, ew qet ti cewaba nade û derdikeve, Elî li derva dipe, ji Elî re dibê “Ew çi ye lo, terlê xwe firotin çiqes zor bû ye!”

Ya oglan ya erkek!

Jineke ducanî hebûye. Wexta ku dergûş were rûdine her kes li ber male dipê û meraq dike ka dergûşa wê lawik e an keçik e! Qadir dibê çi meraq dikine “Ya oğlan ya erkek e.”

Li hortê henîye xist!

Li gund du hevalan li hevdu xistin, sere yekî tê qelişandin, şîkayet dibe û jenderme tên gund ku îfade bigirin, ji ber ku Qêdir dî ke lêxist û seri qelişand, Qadir jî wek şahîd nimandine. Hesen jî ji Qêdir ra dibê “Tu bê min qet tişt nedî, ti kesî me yî here mehkeman tune!”. Jenderme ji Qêdir pirs dike, Qadir qet ti cewaba nade, jenderme careke din pirs dike, Qadir dîsa cewabe nade, Hesen dibê “De bê min tişt nedî, çima nabê!” Qadir dibê “Ez çi bêm Hesen! Merik çing çov girt li hortê henîye xist!”



www.arsivakurdi.org

Ali Çiftçi

"Dunya ji ilmê ditirse û ilim jî ji cehaletê ditirse!"

Kelhasan



Anatoliya Navîn navçeyeke xwedî dîrokeka kevn e. Li Anatoliya Navîn pir qewîm jîyane. Dîroka pir mîletan li vir derbasbûye. Ji mimariya xaniyên kevn û nivîsên li ser van xanî û kevirên li goristanên kevn tê xuya kirin ku berî kurdan hinek ji miletên din jî jiyane. Mixabin li ber rewşa Turkiyê ya siyasî, lêkolînên zanistî yên berbi çav li ser vê navçeyê nehatine kirin. Ji bo piraniya gundên Anatoliyê ji aliyê kurdan ve, di van 300-400 salên dawî de hatine avakirin, ji aliyê dewletê ve tu lêkolîn û agahdarî nehatine berhev kirin û ne jî di arşîvan de hatine parastin. Helbet dewlet li gor xwe xwedî agahdariya ye!.. Lê pirê caran kurdên me yên ku li vir dijîn baş nizanin ka gelo ev ji ku û ji bo ci hatine. Tiştê ku heta niha hatiye gotin û tê zanîn hemû li gor gotinên ku me ji dê û bav yan jî ji mezinên xwe bihîstiye. Ji ber vê yekê jî dema em ê niha gundê Kelhasan bidin nasandin dê li gor agahdariyên ku me li derûdorê xwe bihistine an jiyane, em ê binivisînin. Loma jî agahdariyên ku ez dê li vir binivisînin dê bi kemasî bin. Ez hêvî dikim ku ev nivîsa kurt li ser gundê Kelhasan dê rê veke ku her malbatek bikaribe li ser malbata xwe agahdariyan berhevke ku di pêşerojê de em bikaribin bibin xwediyê dîrokeka gund a dewlemend.

Ji ber di destê me de tam dukoman tunene, tenê li gor gotinan û hinek jî ji arşîvên ku heta niha ji aliyê lêkolînerên ewropîyan ve hatine kirin, em dikarin bêjin ku li Anatoliyê kurd di dawiya sedsala 15an de hatine. Piraniya wan li derûdora Ankarê bi cih bûne. Gundê Kelhasan jî di sedsala 17an de hatiye avakirin.

Tê gotin ku malbata Kelhasan ji derûdora Adiyamanê hatiye. Berê hatine Yunaxê, li Serî Golê mane. Dûre di navbera Kelhasan(Hesgurr) û birayê xwe de dubendîtî destpêdike, Kelhasan tê li bakûrê

www.arsivakurd.org

Kelhesen ciyê ku îro jê ra dibên Çalê malê Avê, konê xwe datîne. Li ciyê ku îro Belediya Kelhasan li ava bûye, mala Hecî Temo dibane. Ev li wir bardikin, Kelhasan tê li wir bicîh dibe. Piştî demekê malbata Hecî Temo bi paşte vedigerin tên li Kelhasan dimînin. Xwerziyê Kelhasan Hewsên jî durê tê li ba xalê xwe dimîne. Kelhasan keça xwe ya bi navê Kurdê dide Hewsên. Îro gundê ku jêra bi tirkî dibên Turanlar(Hewsên) li ser wî hatiye avakirin.

Tê gotin ku navê Kelhasan yê kurdî Hesgurr buyê. Gurr nexwşiyek ku porê însên diweşe û Kelhasan jî bi vê nexwşiya dikeve û porê xwe diveşe. Wê demê bi kurdî jê ra Hesgurr dihatiye gotin. Ji ber vê jî bi tirkî Kelhasan bi nav kirine. Wek piranîya gundên kurdan, navê vî gundî jî bi tirkî Kelhasan hatiye lêkirin. Malên ku îro li gund jê ra dibên; mala Sado, Lawîka û mala Hecî Alo giştik ji malbata Kelhasan in.

Kurmancîya ku li Kelhasan tê deng kirin nêzî kurmanciya Adiyaman, Urfa û Diyarbekirê ye.

Belediya Kelhasan girêdayî Cihanbeyliyê ye. Ji Cihanbeyliyê 42 km dûr e. Li bakûrê rojavayê Cihanbeyliyê dikeve. Bi gundên Yunak, Kulu, Heymanê û Polatliyê re cîran e. Gundên herî nêzik, Bêşqevaxa Mezin, Qendîl, Hecî Omera, Xirave, Kavişoxlu, Gundê Xofê, Kadioxlu, Boyali, Oniska, Boxrîdelik(Tetera), Hecîlera, gundî Buldux û Yenîceobe ne.

Taybetmendiya gundê Kelhasan, li gor gundên din ên Anatoliya Navîn ev e; gund ji eşirek an jî ji du eşîran pêk nehatiye. Ji 30î zêdetir malbatên ku ji her aliyê Kurdistanê û eşîran ve hatine bi cîh bûne. Kelhasanî wek Canbegî tên naskirin. Lê ev nê vê maneyê ku hemû Kelhasanî Canbegî ne. Herçiqas rastiya gund ev be jî îro piraniya gundîyên ji Kelhasan xwe wek Canbegî dizanin!

Ji ber gund ji eşîr û malbatên cihê cihê pêk hatiye, dem dem di navbera malbatan de hinek bûyerên nexweş rûdane û ji ber vê yekê jî navê kelhasaniya li gundên cîran wek bi şerrûdî derketiye. Helbet ev nexweşîyên ku bûne ne tenê ji mesela eşîretiyê, bi ya min sebeba herî mezin ji cehaletiyê rûdane.

Nifşê nû(neslê nû) hêdî xwenda û xwedî tercûbeyên dewlemend in. Hêdî eşîrtî û malbatî li paş xwe hiştine. Hemû xwe Kelhasanî dizanin. Li gund û zimanê xwe dixwazin xwedî derkevin.

Kelhasan heta 1992 an vek muxtari dihat îdare kirin. 1992 an de bû belediye. Serokatiya belediyê heta 1999an ji aliyê Ali Ceran ve hat meşandin. 1999an Mustafa Kargöz bûye serok. Piştî kuştina Mustafa Karagöz, Abdullah Bozkır heta 2004an serokatiya belediyê kiriye. Ji 2004an vir de jî Resul Kara serokatiya belediyê dimeşîne.

Di hilbijartina 2004an de dengên partiyên siyasî weng bû;

Partî	hejmara denga	ji sedî %
AKP	260	44,27
DYP	195	30,95
CHP	175	27,78
Yen din	0	0

Hejmara yên xwedî deng 854 bûn. Ên ku dengê xwe dane ji sedî 73,77 in.

Nifûsa Kelhasan li gor hejmartina giştî "genel sayim" a 2000î 2533 ye. Li gor rêvebirên belediyê, du kat ji wan jî li derweyî Kelhasan dimînin. Yanî meriv dikare bê-

www.arsivekurdi.org



Yayla malê Şilik û Hewsên (Turana)

je tahmînî hejmara Kelhesenîya li ser hev 7500 e. Ji 1968an vir ve goçberiya Almanya û Danmarkê destpêkiriye. Li welatên Ewropa; Almanya, Danmark, Swîsre, Swêd, Finlandiya, Norveç, Îtalya, Avusturya, Belçika û Fransayê bi cîh bune. Îro li Danmarkê êdî neslî sisêya dijî! Ji sedî 70 Kelhasanî li derveyî gund dijîn. Piraniya wan jî li Danmark in. Dîsan hejmareke zêde ji ber xwendin an ticaretê barkiririne Qonyê.

Ji neslê nû hema hema meriv dikarê bêje ji sedî 90î derketine welatên Ewropa.

Li gund mekteba destpêkê(ilkokul) û liseyek heye. Ji ber neslê nû her bi hayalên derketina welatên Ewropa dijîn, xort û civanên ku li universitê dixwînin pir kêm in. Herciqas xwesteka xwendina zarokan bilind be jî, ji ber rewşa aborî meyla ciwana her ber bi welatên Ewropa ve ye. Di van salên dawî de hejmara kesên li universitê dixwînin hinek zêde bûne.

Rewşa aborî

Li gor agahdariyên belediyê, rewşa belediya Kelhasan di warê aborî de baş e. Belediyê tu deynên xwe tunene. Perê ku ji İller Bankasi ku li gor hejmara rûniştîyên li gund(nifusa belediyê) tên, têrî 6 memûr û 5 karkeran û mesrefên din dike. Problema herî mezin rîyên belediyê ne. Ji ber di despêkê de avahîyên/xaniyên li gund, bê plan hatine çêkirin, aniha jî xirakirina van xaniyana problema gund a herî mezin e. Ji ber vê jî serokê belediyê yî duyemîn, Mustafa Karagöz 1999an de bû qurbaniyê vê!...

Problemeka din a mezin jî bêkarî ye!...

Wek piranîya gundên Kulu û Cihanbeylîye, aboriya Kelhasan jî li ser çandinî û xwedîkirina pêz e. Çandinî bi piranî ce û genim e. Aboriya gund ji sedî 70î li ser însanên li welatên Ewropa dijîn, e. Xortên ku li gund mane jî dewara xwe bi nakliye û çandinîyê ve dimeşînin.

Kelhasan xwedî arazî û erdê çandinîyeke mezin e. Heta 1956an Kelhasan, Turana û Korkmeza giştik li ser hev bi gund (Kişlê) ve girêdayî bûn. Turana 1956an de ji gund veqetiya bi yayla Korkmeza ve bi serê xwe bun muxtariyet. Korkmeza jî di 1992an de ji Turana veqetîn û bi serê xwe bûn muxtariyet. Ji ber pireşîrî û mezinîya gund piraniya malbatên mezin bi serê xwe bibun xwedî zozana(yayla). Jiber hem xwedîkirina pez û dewarên xwe û hem jî nêzî erdên xwe, ji xwe re zozan an gom ava dikirin. A niha li piraniya van zozanana xaniyên modern hatine avakirin. Herçiqas piraniya van li bajarên wek Qonya û Ankarê an li welatên Ewropa jî dimînin, li havînan tên ser zozanên xwe. Ew warên ku berê ji bo dewara malê dihatin bi karanîn niha bûne wek havîngeh!

Fêkîyên bejî

Mamix, pêçek, dureşik, şilan, behîv (badem) guvîş, rihok, çortik(hurmîyên bejî)
Giyayên bejî ku tên xwarinê(pincar): kereng, silmastik, pûng, tirşo, sibirge, qanik, nançûcik, toltolik, tirpa yawan, kirtilkayax, pîvok

Navdarên kevn ên dengbêj(şare):

Almasa Qerbeko, Eş Kizot, Dudikê Seydo(Diya Cejno), Menê Seydo, Osmanî Qeremistikê, Heyîsmaîlî Remo, Omkî Elo(Qirik), Mistoyî Usikê malê şilik(Zero), Osmanî Kiçê, Topcî Seydo, Memkî Seydo, Hemîtî Eçê, Nazo, Mehmedî Omoyî Kişo

Dengbêj û hunermedên nû:

Mehmedî Omoyî Kuftê, Hemoyî Qîro, Yusuf Taş(Uso), Piçoyî Lako, Dedoyî Evo, Bebek, Nazoyî Îsmaîl, Tato, Bayram Özcan, Hesenî lufî!, Hesenî Hemtî Têlê, Yaşar Taş, Nûro û Fêtî (Koma aştî), Bekoyî Gozê (Bekir Turan), Dilxweş(Memoyî Rehmê), Ramazan Ekici û Cejno. Yên ku navên wan me ji bîrkirine jî dikarin hebin. Em ji niha de lêborina xwe ji wan dixwazin.

Kanîyên kevn:

Kaniya malê Lawika, Kaniya Hecî Delalê, Kaniya Mala. Li yalê Hewsên: kaniya Zeynikê, kaniya Hodo û li yalê malê Şilik jî kaniya Simo bi navûdeng in.

Zozan(yayle):

Yayla Malê Gepê(Boyluca: Erdoğan, Çiftçi û Çakmak), Yayla Îsmêl(Çakmak), Yayla Malê Giro, Yayla malê Hemikê, yayla malê Tato, yayla Mehmedî Hesenekê, yayla malê Hecî Elî, yayla Buldúxî Lolê, yayla malê Şilik(Özdenler), yayla malê Lawika(Seçilmişler), Yayla malê Kuftê, yayla Kêfkur, yayla Arif Cesûr, yayla Çêviş, înê malê Hewsên, goma Emer, goma Hecdede, goma Remkî Dedo, goma Omkê Vixikê, yayla Kulikê, Baxcê Lîlikê, gomêa Tefo Keçûnê, goma Fêyîq, goma Misto Meyremê û Susiz

Ji bo alikariya hinek agahdariyên li ser Belediya Kelhasan ji Cemal Yazar (memûrê belediyê), Mecit Çifçi, Osman Çifçi û Bayram Turan re spas dikim.

Ali Çiftçi

www.arsivekurdi.org

Malbatên li Kelhasan

Navên malbatan ên bi kurdî	Paşnavên wan bi tirkî
1. Mala Kelhasan(Mala Sado, Lawika û Hecî Alo)	Seçilmiş
2. Mala Tato(Têrîkî)	Yaşar
3. Mala Avê(Têrîkî)	Özcan
4. Mala Heci Temo(Têrîkî)	Demir
5. Mala Seqê	Çalış/Özdemir
6. Mala Qertêl	Kantar
7. Mala Tûrika	Avcı
8. Mala Simoyê Otê	Çelik
9. Mala Husî Mendê(Hemikê)	Temiz
10. Mala Qiro(Hewrişk)	Taş
11. Mala Gepê(gepî)	Erdoğan/Çakmak
12. Mala Hecî Köse(malê Fîtê)	Çiftçi
13. Mala Dîno/Nevo	Yazar
14. Mala Hecî Qito (Têrika)	Kaya
15. Mala Bellê	Baran
16. Mala Devrêşî Yuwikê	Koç
17. Mala Kuftê	Ekici
18. Mala Şekro	Doğan
19. Mala Bozkira	Bozkır
20. Mala Guro	Taşkın
21. Mala Beko Qilcî (ji Corumê hatine)	Kılıç
22. Mala Teyarî Tûr	Yorulmaz
23. Mala Heyhey(ji Oniska)	Kara
24. Mala Qarê	Ceyran
25. Mala Kirrê	Görmez
26. Mala Cingoz	Erman
27. Mala Beyro	Çetin
28. Mala Pitê	Çalış

www.arsivakurdi.org

Navên malbatan ên bi kurdî	Paşnavên wan bi tirkî
29. Mala Hec Elî	Yildırım
30. Mala Kurdo	Karaman
31. Mala Hesenî Bodê	Sertdemir
32. Mala Bekê	Bakır
33. Mala Lîlîkê	Biçer

Yaylê Hewsên (Turanlar)

34. Mala Hewsên	Turan
35. Mala Milsen	Durmaz
36. Mala (Hepoliyê)	Yilan
37. Mala Kêfkur	Polat
38. Mala Beto	Polat
39. Mala Kurdoyê Sofî(Şilik)	Özden
40. Mala Hecêlî	Yildırım
41. Mala Hesenî	Atici

Delala (Korkmazlar)

42. Malê Qer Beko	Dalan
43. Mala Omeri Xanikê	Dalan
44. Mala Delalê	Korkmaz
45. Mala Mistê Teyêr	Pekerman
46. Mala Guro Gulê	Dalan
47. Mala Hesko	Çoban/Cesur
Mala Betalî Qalo	Özmen
48. Mala Dewreşî Micê	Demirtaş
49. Mala Guro Qaqo	Sağci

www.arsivakurdi.org

Ji Kelhasanan çend kilamên dila û şinan

Kilamên dilan

Te ra nawêm Fatê lê, diwêm Kewê lê
Min ra bûye gulsosina biharê lê
Te nawînim lê, li her derê lê
Tu dirize lê, salê carê lê

Navê te Narîn lênane lê
Navê min Mistefa Pehlîvan e lê
Carê xarbim werim rûyane lê
Ew jî xêra lê dê û bavan e lê

Min li ziyaretê lê bez dibirî lê
Melûl melûl min li du te nirî lê
Tu li bîra min neçû lê li vî girî lê
Mîrata emrêkê lê tiliya min birî lê
Êdî were lê dilê min Fatê Lê

Bavî min şivan lê bavî te axa ye lê
Bavî min li bavî te danaxe lê
Bavî te yî beg e lê bavî min şah e lê
Were mala min tu sêjdê raxê lê

Mistefayî Xelê
Berhevkar: Cejno

Çindî

Ba berf biya, ba baran biya
pezê Cîndî li ser malan biya
Şîv û şevîn li ser xwediyan biya
Bila roketin li ser yara biya

Aman Çîndî heyran Çindî
Tu xwe mede vî bilind î
Di ser te ra sond xwarî me
Mêra nakim li vî gundî

Îro roya kinç şûştinê ye lo
Osandbûme li çûyîn û hatinê lo

Bila Xwedê dilmiradê me bikira
Ez ê royê heft caran bihatima kuştinê

Aman Çindî heyran Çindî
Tu xwe mede li vî bilind î.

Gotin: Nesiba Beyro
Berhevkar: Cejno

Bodikê

Wey Bodikê Bodikê Bodikê
Her yallah Bodikê
Manga belek ho dike
Her yallah Bodikê
Mange dot golik berda
Her yallah Bodikê
Av di tasê werneda
Her yallah Bodikê

Bodik çûye bin dara
Her yallah Bodikê
Qiriya mîna kara
Her yallah Bodikê
Nêmaye li benda karika
Her yallah Bodikê
Bodika min hîna qîz e
Li ber xortan dilîze
Her yallah Bodikê
Dilê lêwek î zîz e
Her yallah Bodikê

www.arsivakurdi.org

Folklor

Keriyek pez li Çêl e
Gulmilhemê canê
Gulmilhema xortan e
Gulmilhemê canê
Belav bû têl bi têl e
Gulmilhemê canê

Wey canê canê canê
Gulmilhemê canê
Gulmilhema xortan e
Gulmilhemê canê

Du zeriyê jêlva têne
Gulmilhemê canê
Yeka min yeka hevêl e
Gulmilhemê canê

Zeriyê hewêl ê geş e
Gulmilhemê canê
Zeriyê min nexweş e
Gulmilhemê canê

Zeriyê hewêl nexweş e
Gulmilhemê canê
Zeriyê min ji bo min pir xweş e
Gulmilhemê canê

Topcî

Ro li diya narin li diya
pezên van zaliman hatin daketin siya
Çavê min xêrnediyê li sekoyê reşî li ser pîya
Êdî were lawo dayika te peqîya
Ê biye dêlgura li ser çiya

Ev sibe ye xweş berbang e
Min dî erebekê têye lang e lang e
Xeberdana xeber dan,
go kuştiyekî li mêla gavura biye
Hey wex hey wex min got çima
Hûn çima nabên beranê min î Kosedaxê
bi soreng e
Lo qetilo, lêmexîne!
Malşewitiyo qurşûnek xwe di sera bavê, bitirsîne
Ê de bavê li cotên heşba xîne
Tu nizane mîratê mîratan
Ê erebê bigrên birevînin
Ê xwîna yaroyê min li çiya û banîya birêjînin

Werin li mino vê ecêbê
We dît cito şînê biye li ber şerbetê
Ro li diya narin li diya
Êdî vere lawo, dayika te peqîya
Ezê mîna dêlgura serê çiya
Ê de ez ê li Topciyê xwe geriyam
.....

Gotin: Almasa malê Qerbeko
Ji dengê Cejno hatiye girtin

Parçeyek ji kilamê hatiye berhevkirin. Ew qilama pir dirêj e. Mixabin hemû nehatine berhev kirin.

www.arsivakurdi.org

Nubê Hecê

Ji bo Xelikaneke ava, pak û bextewar

Kî jîyaneke xweş û bexteyar li Xelika û Xelikeke pak û ava naxwaze? Pirs ev e ku sewa vê, li Xelika çi gerek e bê kirin?

Di sêrî da, ji bo ku bersiva vê pirsê bê dayîn fikir û mineqeşe divên. Bi vê beyanê ez dixwazim bi dîtîn û pêşnîyazên xwe yên ku min li jêr rêzkirine, tevê mineqeşeya ku tê kirin, bibim. Armanc û hêviya min ji vê ew e ku derd, tahlî û xwestekên Xelika werin tarîfkirin û ji vê pêva jî li ser fikir, pêşnîyaz û projeyên ji bo çaredîtînê lihevhatineke civatî derkeve meydanê.

Nav li ser e, Xelika navê qesebaya me yê ku ji bav û kalan da ma ye. Lê bi resmî navê wê Karacadag e. Ez nawêm ku va nava rawe yan jî were guhêrîn. Li hêlê wî, navê wê yê kurmancî, Xelika jî hewe û her du nav jî resmî bin. Mîna vê, navê mehela û cada jî bi du zimane be.

Kurmancî zimanê Xelika yê makî ye. Lê ew î ji Ewûrûyê asîmîlasyonê û êhmalî û bêxemîya me da, her ku dıhere ji bîr dibe û ber bi wendabûnê dihere.

Ez ne lı hember zimanê tirkî me. Tirkî zimanê resmî û perwerdê ye. Em bixwazin û nexwazin jî, tirkî jî êdin bûyê zimanê xelikîyan yê duduya, meriv dikane biwê, ew jî ji wan ra bûye zimanê makî yê duduyan.

Li mekteban tunebûna dersên ziman û edebîyata kurmancî û îmkanên hînbûna kurmancîyê gerek e ku wekî heqeret û beqîmetkirina ziman û nasnameya kurmancî ya kulturî bê hesibandın. Ev gunekarîyek e û tê da para me bixwe jî heye.

Wezîfeya beledîya yek jî li kultur û zimên xwedî derketin e. Ne mixtara, ne reîsên beledîyê, ne jî xwanda û ronakbîrên Xelika heta niha malesef sewa nasnameya (kîmlîk) Xelika ya kulturî û zimanî tu tişt nekirin.

Gerek e xelikî gî tevhev li nav û nasnameya xwe ya kurmancî xwedî derkevin û bixwazin ku dersa kurmancî li mekteban hebe û sewa vê bikevin nav kar û hewldanên (girişim) meşrû, qanûnî û sîvîl.

Heqe xwe ye ku beledîye jî li navê Xelika xwedî derkeve, qedra kurmancîyê bizana; dengkirin û hîmkirina kurmancîyê teşwîq bike; destek bide projeyên li ser vê mijarê.

www.arsivakurdi.org

- Xelikî mîna berê ne li ser hev in. Ew li her derê dinyê belav bûne; li Qulekê, Qonîyê, Anqerê û welatên Ewrupayê (Almanyê, Hollandê, Swêd) xelikî hene.

Jihev dûrketin bi xwe re ji hevdu bîrkirinê û yadbûnê tîne.

Sewa ku eleqaya xelikîya, çi li Xelika û çi li dervayî Xelika bi hevra hebe, ragihandin (iletişim) gerek e. Ev jî bi rêya dezgeh û sazîyên (araç,kurum) wekî komele, weqif, înternetê û bi rêya şênî û şahîyên kulturî mimkun e.

Halhazir li Ewrupayê du komeleyên (Karawitt û Komfon) xelikîya hene. Ew her yek li gora îmkan û kanîna xwe alîkarîya projeyên sosyal û kesên ku di têngîyê da ne dike. Wana îsal (2005) bi hev ra li Wîttenê şahîyekê kulturî çêkirin. Hêvî ew e ku ev hevkarîya wan dewam bike û xelikîyên li Ewrupayê bibin endamê wan yan alkarîyê wan bikin.

Tiştê ku meriv pê diêşe ew e ku li Xelika bi xwe hîn tu sazîyên weng çênebûne. Ev jî kêmanîyeke mezin e û xelikî ne rewayî wê ne. Li Xelika dusê qehwexane hene. Çima kulturxanek tune? Sazîyeke li ser vî navî yan jî li ser navekî din ji Xelika ra ne şert e?

Gerek e ku sazîyeke ha bi serî xwe (otonom) be. Yanê ew ne malê tu partî û freksîyonê sîyasî be û tê da kar li ser projeyên li ser mijarên (konu) hunerî, sporî, pakîya derdorî, perwerdeyî, kursên kurmancî û meslekî bê kirin. Beledîye û xelikî hemû destek bidin sazîyeke bi vî tonî.

Jîyaneke xweş û bexteyar li Xelika, Xelikake pak û ava bê angajmanê xelikîya û bê sazîyên sîvîl, civatî û demokratîk û bê hevgirtin û hevkarîya xelikîya nabe. Ji derd û tahlîyên Xelika ra ancax bi vê rê çare ware dîtîn. Loma gerek e ku xelikî bi vî karî ra rabin.

- Li Xelika di helbijartina mixtarî û beledîyê da tiştekî pir neçê heye û li her helbijartinê tê dubarekirin. Meriv naxwaze ku wê bi nav bike û bibîse. Ew jî bikaranîya mermalitî û qebîletîyê di propaganda helbijartinê û rayxwastinê daye

Gerek e ku namzedê reîstî û mixtarîyê bi fikir û projeyên xwe û partîyên xwe derkevin pêş helbijêran (seçmen) û sewa vê raya bixwazin. Ne durust e ku sewa raya lome û serhevde di heqê qebîle û malbatan da bên gotin. Hêvî ew e ku ev kevnedeta rokê pêş da ji ortê rabe. Di mineqeşeyên helbijartinê da gerek e ku şûna heqeret û piçûkdîtin û sûvahatinê tune be. Hurmeta raqîb û alîgirên wan ji hevra hebin.

Xwastek ew e ku li Xelika kultureke nû, kultura demoratik, dilferehî, texemulî bi şûn bibe. Ez bangê helbijêran dikim ku ew wexta helbijartînê, li fikir û projeyên namzedan bifkirin, ka ew ji bo nasnameya Xelika a kurmanc, ji bo Xelikeke pak û ava çi dixwazin bikin û dengê xwe li gorê vê bidin.

Ji reîs û meclîsa beledîyê tê payîn ku di kar û xebata wana da aşkeretî û zelaltî hebe û ew xelkê teve karê xwe bikin û wî ji hesab û kîtabên beledîyê haya-

www.arsivakurdi.org

dar bikin. Şayanî gotinê ye ku derd û tahlîyên Xelika ne tenê yên reisê beledîyê ne û ji wan ra çaredîtîn ne tenê wezîfeya reîsê û meclîsa beledîyê ye.

Heqê her kesî ye ku karê beledîyê rexne (eleştiri) bike. Lê gerek e ku rexne bi kêr be, fêdeya xwe bibe. Li hêla rexnekirine, gerek e meriv alkarîya beledîyê bike, destek bide projeyên wê û mesuliyetê hilne ser xwe.

Di vê dewrê da, jîyan mîna avê diheriqe dihere û her tişt pir zû tê guhêrîn. Tiştên ku bi sedan sala hebûn, niha nemane; ji xanîyê kevn da bigrê heta xalîyên desta, ji xeftanê jinan heta qawqacaxê aşxana pir tişt wenda bûne. Bi nemayîna wana va, zanîn û hunera di heqê wana da jî bîr û wenda dibin. Va jî ji kêskî nasnameya Xelika dihere.

Loma ez pêşnîyaz dikim ku beledîye xanîyê malê Hecî yê kevn bistîne û wî wekî orjînalê xwe restore ke û bike entîkxaneya (muze) Xelika. Têda, ji tişt û haydarîyên li ser tarîx, kultur û jîyana royê ya Xelika nimune werin rêxistin û sêrkirin.

Ji bîrmekin, civateke ku tarîx û kultura xwe nasnake û bi şanake biparêze rîya xwe zû şaş dike û li ser rûyê dinyê wenda dibe.

DEM

herroj sîyê

dirêj dibê

wê hin ji

dilê wî

derve nekirî yê

heyf e ke ku

neyê nivisandin

Seyfi Doğan

www.arsivakurdi.org

Hilmî Yeşiltaş

ŞÎRÊ BIZINÊ

Va çîroka mezinê me ji me ra digotin. Bi yadîgarîya wan ez ê vê carik din bi zaravayê gundî xwe ji we ra binivsînim. Lê hinek gotinên ku tirkî tê de bûne zelaltir bikim.

Li kêleka gundekî mala pîrikekê hebûye. Di wê malê de bi biziznek xwe va dijîyabûye. Rokê pîrikê şîrê bizinê xwe dotîye û cîngila şîr daye ber qula malê. Havîn bûye û heyam germ bûye. Loma pîrikê qul û pencere lihev dihiştıne. Nêzîkê gund daristanek hebûye. Tê da pir heywanê curbecur hebûne. Lê ya ku tim derûdora gund digerî tim rivî bûye.

Dîsa wê royê rivî berê xwe daye ber gund va. Gava ku nêzik gund bûye, heman bihna şîr ketîye pozê rivî. Nerîye ku qula malê jî lihev e, pir şa bûye. Çûye têra dilê xwe şîr ve xwarîye û dawestaye ku pîrik were wî bibîne.

Gava ku pîrik hatîye û dîye ku rivî şîr vexwarîye, pir aciz bûye. Daye dû rivî, lê rivî revîye û baz daye ser zindarekî ku nêzik mala pîrikê bûye. Paşê jî qerfê xwe bi pîrikê kiriye û li ser pîrikê kilam jî gotıye: Mi rî tatê, pîr ma matê. Mi rî tatê, pîr ma matê...

Roya dîn rivî dîsa hatîye dora malê. Nerîye ku qula malê dîsa jihev e û cîngila şîr jî li ber qulê ye, heman xwe berdaye şîr û bi firefir şîrê pîrê vexwarîye. Paşê çûye û dîsa bazdaye ser zindêr û xwe daye benda pîrikê. Pîrik gava ku hatîye mal, dîsa dîye ku şîr tunê. Zanîye ku va dîsa îşê rivî ye û derketîye derva ku li rivî bigere. Rivî dîsa li ser zindêr deng daye xwe; Mi rî tatê, pîr ma matê. Mi rî tatê, pîr ma matê...

Pîrikê nerîye ku rivî li serî wê dibîye bela, qerar daye ku dersekê bide wî. Roya sisîya pîrikê şîr kirîye çînikekê û bi xwe birîye û danîye ser zindêr. Lê berîya wê zindar gî bi qîrê boyax kirîye.

Gava ku rivî hatîye û dîye ku şîr î hazir e giştik vexwarîye. Dû ra carê serê xwe rakirîye û nerîye ku pîrikê ber wî va têye, xwastîye ku bireve. Hewl daye ku bibeze, lê boçika wî bi qîrê va nûsikîye û senekirîye ku bireve. Xwe çend cara bi quwetê pêşva avêtîye ku xwe bifilîtîne û bi bazdandinekê ve boçika wî qetîye û rivî filitîye û revîye. Pîrikê jî boçika rivî birîye mal û bi morîya xemilandîye û li dîwarê malê lı darxistîye.

www.arsivakurdi.org

Gava ku rivî çûye nav heywanên daristanê, vê carê jî wana qerfê xwe bi rivî kirine û li ser wî kilam stirandine: Qol qito, binî boçê hilqito. Qol qito, binî boçê hilqito...

Rivî pirr xemgîn bûye û çûye rev pîrikê. Gotîye; Pîrê, pîrê! ka boçikê min bide min. Gava ku ez terime nav hevalan, gî li min qerfê xwe dikin û bi min dikenin. Ji min ra dibên: qol qito, qol qito, binî boçê hilqito...

Pîrikê gotîye: here ji min ra şîrî min dîsa bîne, ez jî boçê te bidim te.

Rivî tere hindê bizinê û jê ra dibê: Bizinê, bizinê. Ka çîkê şîr bide min. Ez şîr bidim pîrikê. Ba ew jî boçikê min bide min. Gava ku ez terime nav hevalan, gî li min qerfê xwe dikin û bi min dikenin. Jı min ra dibên: qol qito, qol qito, binî boçê hilqito...

Bizin jê ra dibê: Here ji min ra avê bîne û ez vexwim. Ezê şîr bidim te.

Rivî vê carê jî tere rev bîra avê û jê ra dibê: Bîrê, bîrê! ka avinê bide min. Ez avê bidim bizinê. Ba bizin jî şîr bide min. Ez şîr bidim pîrikê.

Ba ew jî boçikê min bide min. Gava ku ez terime nav hevalan, gî bi min qerfê xwe dikin û bi min dikenin. Min ra dibên: qol qito, qol qito, binî boçê hilqito...

Bîr jê ra dibê: Here keçika bîne, ba li dor min bazdin û bîlizin. Ezê avê bidim te.

Rivî li wir derdikeve û tere ba keçika û li wan ra dibê: Keçikino, keçikino! Ca werin li dor bîrê bazdin. Ba bîr jî avê bide min. Ez avê bidim bizinê. Ba bizin jî şîr bide min. Ez şîr bidim pîrikê. Ba ew jî boçikê min bide min. Gava ku ez terime nav hevalan, gî bi min qerfê xwe dikin û bi min dikenin. Jı min ra dibên: qol qito, qol qito, binî boçê hilqito...

Keçik jê ra dibên: Here qunderê me çêke û bîne. Em jî werin li dor bîrê bazdin. Rivî vê carê jî tere ba koşkêr û lê ra dibê: Koşkaro, koşkaro! Ha van qunderana çêbike û bide min. Ez vana bidim keçika. Ba keçik jî werin li dor bîrê bazdin. Ba bîr jî avê bide min. Ez avê bidim bizinê. Ba bizin jî şîr bide min. Ez şîr bidim pîrikê. Ba ew jî boçikê min bide min. Gava ku ez terime nav hevalan, gî bi min qerfê xwe dikin û bi min dikenin. Ji min ra dibên: qol qito, qol qito, binî boçê hilqito...

Koşkar jî jê ra dibê: Here ji min ra hêkina bîne. Ez jî qundera çêbikim.

Rivî li wir derdikeve û tere rev mirîşka. Li wan ra dibê: Mirîşkno, mirîşkno! Ca hêkina bidin min. Ez wan bidim koşkêr. Ba koşkar jî qunderê keçika çêbike. Ez qundera bidim keçika. Ba keçik jî werin li dor bîrê bazdin. Ba bîr jî avê bide min. Ez avê bidim bizinê. Ba bizin jî şîr bide min. Ez şîr bidim pîrikê. Ba ew jî boçikê min bide min. Gava ku ez terime nav hevalan, gî li min qerfê xwe dikin û bi min dikenin. Ji min ra dibên: qol qito, qol qito, binî boçê hilqito...

Mirîşk jê ra dibên: Here jı me ra geniminî bîne. Em jî hêka bidin te. Rivî vê carê jî tere ba xermancîya. Rivî êdî

li gerînê hosan bûye. Sewa wê bi derewa li xermancîya ra dibê: Xermancîno, xermancîno! Gûr ketin ser hespê we, bibezin û hespê xwe xelaskin.

Xermancî zevîyê xwe cîh dihêlin û dibezin ku hespê xwe xelaskin. Rivî jî qesî têra mirîşka genim didize û dibe dide mirîşka. Mirîşk jî hêkina didin wî. Rivî hêka dibe û dide koşkêr. Koşkar jî qunderê keçikan çêdike û dide wî. Rivî qundera dibe û dide keçikan. Keçik jî tên û li dora bîrê bazdidin. Bîr jî avê dide rivî. Rivî avê dibe û dide bizinê. Bizin jî şîr dide rivî. Rivî şîr dibe û dide pîrikê. Pîrik jî boçika wî dide wî.

Rivî boçika xwe bi xwe va dike û tere nav hevalên xwe. Heval jê ra dibên: Rivîyo, rivîyo! Te va boçika xemilandî û diçûlise li ku anîye? Xwezî ku boçikên me jî weha bin.

Rivî li wan jı ra dibê: Min xwe avêt bîra avê. Gava ku ez derketim, va boçika bi min va bû...

Gava ku hevalên wî vê qisê dibîhîsin, gî bihev ra dibezin û xwe diavên bîra avê û gî tê da difetisin. Rivî jî bi kêfxwaşî li dû wan dikene û dibê: We qerfê xwe bi min kirin û bi min kenîn. Min jî heyfa xwe ji we stand.Min xwar parîyek mast, çîvroka min bû rast....

BİR GÜN

Belleğimde uyanan

resimlere baktım

insaf ve iman yoktu

gülüşünü

gülüşünü

çalıyorlar

çocukların

her bahar günü

baktım

şöyle bir yokladım

bir

su

bir de

ateş

aklıma geldi


Seyfi Doğan

www.arsivakurdi.org

Roportaj: Altun Başaran







Li ser çêkirina tewna bi Ayşe Barlas re hevpeyivînek

– Ez kurd im, ji alîyê Anatoliya Navîn, ji gundê Omera me. Li wir hatime dunê û li wir mezin bûme. Me li wê derê tevn ji bo ceyîzên keçîk û bûka çêdikir. Vana me bi herîyê pêz çêdikirin, li biharê, di meha gulanê de mêrê me pêz dibirîn. Ev herîya jinan bi ava xalî dişûştin û li ber ro, bi tîna ro ziya dikirin. Li pişt wê herî bi sê diskînîn. Li wê wextê keç û xort bi hev re herî diskinîn. Dema wan ev kara bi hev ra dikirin, yên ku dilê van li hev bûn, nav gilokekê kevirek dikirinê û davêtin hev. Yekî ku dilê xwe li yekê hebûya giloka bi kevir davêtê û bi vê re hezkirina xwe eşkere dikir.



Ristin

Li pişt diskînîna heriyê, dest bi rêstinê dikirin. Heri bi teşîyê diristin. Dema teşîristinê jin li siyê mala, li bind siya daran yan jî li malekê dicivîn hev û hem teşîyên xwe diristin û hem jî stranên xwe digotin. Stranên xwe pirê caran yên dila û şênavîyê bûn. Car cara stranên şînê jî digotin. Bi hev re pêşbirik û yaranî jî dikirin.

Qulaç

Piştî teşîristinê ev rîsa qulaç dikirin. Ew qulaç bi herdû pîyên xwe bi dirêjîya pîyên xwe rîs qulaç dikirin. Ev ji bo wan wek cimnastîk bû. Ew qulaçana ji bo denê re hazir dikirin.

Den

Li payîzê dencî (boyaxcî) dihate gund û li nêzî kanîyêkê tewrî dibû. Li gund xeberê her kesî dibû ku dencî hatîye, hêdî her kes diket dorê ji bo risê xwe boyax bike. Rengên ku pê risên xwe boyax dikirin giranîya van kesk, sor, zer û spî bûn. Piştî dendanê bi avê xalî risên xwe dişûştin û li ber tîna ro ziwa dikirin. Piştî danê glokê xwe diziyan, birekê xwe dibirîn ji bo tevnê.

Dagirtina tevnê

Tevn ji çar singa pêk tê. Sing di erdê de dikutandin. Her serikî paliyek didane ber û li vana rîs dipêçandin… Li her serikî du jin rudiniştin. Di navbarê her serikî de jî yekê derav dibir û dina. Di dûva jî gura tevnê heytinan û ji dagirtinê ra serrast dikirin. Hertim du kes li ber rûdiniştin. Ji sibê de hetanî êvarê bûkên bi dergûşî, bi ningên xwe hilikên dergûşên xwe hildikirin û bi destên xwe jî tevinên xwe dikirin. Vana xalî, balîf, mînder, xalîdîwar, tulu, gelt, çal, têr, heqîv, bedenîzilanî, bedenîreşî, bedenîyalancî dikirin. Wextak ew li ber tevnê bûn, cîran û heval dihatin dorê û sohbet dikirin. Kilamên dilan û yên şînan distiran. Behsa zemanê berê dikirin.

www.arsivakurdi.org

Mem Xelîkan

Destbiratî û xwînbiratî

Dîrokzanê yunan Herodot di eserê xwe de, qala şerê Medan û Lîdîyan dike. Di derekê de wer dibê:

"...Di navberê Medan û Lîdîyan de şer derket û pênc salan ajot. Geh Med geh jî Lîdî bi ser diketin. Dema ku şer kete sala şeşan û her du hêl berhember man, di ortê şer de ji nişka ve roreş bû (ro hate girtin)...

Bi ser vê de, Med û Lîdîyan cîlê şer dawestandin û tavlê li hev hatin.

Giregirê Babîl û Kîlîkîyan xwe avêtin navberê, bûne wekîlê zewaceke di navberên malbatên keya (qiral) ên Med û Lîdîyan de. Bi fikra wan, lihevhatineke temendirêj tenê bi rîya zewaceke weng mimkûn bû.

Ji xêyri vê, sewa lihevhatinê, xelkê wan deran jî mîna yunanan destpîyê xwe xwîn dikirin û xwîna hev dialastin..."

Van bûyeran ta du hezar pêncsed salî di ber vê, li hundurê Anatoliyê qewimîne.

Ji dîrokzan û lêkolînêran hinek Medan wekî ecdadên kurdan qebûl dikin. Wê dewrê, hudûdê împeretoriya Medan gihêştibû çemê Sor (kızılırmak), yanê mintiqa ku îro kurd jî lê hene.

Ji qalkirina Herodot meriv derdixe ku seba lihevhatin û biratîyê xwîna hev mêtin edeteke pir kevn e. Lê ev edeta ha heta duhpêr li ba kurdên Anatolîyê jî hebû.

Ji bo destbirakî û hevaltîyê xwîna hev mêtin di dema zaroktiya min de jî hebû. Du zarokan ya jî xortan destpiyê xwe xwîn dikirin û xwîna hev dimêtin û dibûn xwînbira.

Li Xelika xwînbirakî min heye. Ez û Hemidê Hecê (Deveci), guhê xwe bizîn, him hemsalê hev in, him jî hevalê hev ên berxçêrandinê ne. Me li çolê xwîna hev mêt û bûn xwînbira, bûn hevalên hev ên ji dil û can.

Xwînbiratî tê meneya ji hev hezkirinê. Xwînbira di tengîyê de bi ser hev de tên û li hev xwedî derdikevin.

Xwînbiratî ji hêlekê de di ser biratîya biyolojik re ye. Biratîya ji dê û bavekî ne bi destê meriv e. Lê xwînbiratî bi dilê meriv e. Navberê xwînbirakan tîr e, mina ku dibên, av tê re nare.

Biratîyeke din jî hebû ku du zarokan şîrê dayikekê dimêtin û bibûna bira yan jî xweng û bira. Ev jî şîrbiratî ye.

Ev edetana êdî nema ne. Şûna bi-

www.arsivakurdi.org

ratî û hevaltîyê menfetperestîyê girtiye. Seba menfetê bira li birê zilm û neheqîyê dike.

Li ser erdê ku Med û Lîdîyan şer kiriye, îro tirk û kurd hene û şerê hev dikin.

Çima?

Kurd dibên, " em jî milet in û gereke wekî miletekî bi serî xwe werin qebûl kirin!" Lê tirk vê yekê qebûl nakin.

Desthilatdarên Tirkîyê li hemberî ziman, kultur, nav û nîşanên kurdan bê texemul in; him jî bêtexemuliyeke gelek mezin.

Serleşker H. Ozturk kurd mîna "qaşo hemwelatî" ("sozde vatandaş") bi nav kiribû.

Dozgerê Cumhuriyetê yê bajarê Amedê ji bo kurdan dibê, "goya xelkê Kurd".

Wezîrê asayîşê A.K. Aksu ferman daye ku di meşîn û şahîyên Newrozê de, ji alaya tirkan(bayraqa tirkan) bêtir, tu alayekê din nayên hildan. Yanê ala û rengê kurdan qedexe (yasak) in.

Ji ber van nerindî û neheqîyan navbera tirk û kurdan neçê ye û şerê hev dikin.

Em ê li benda wê rojê ne ku tirk û kurd xwîna hev bimêtin, li hev werin û bibin xwînbirayê hev ên rast û durist.

XWAZÎ

ji Sefo re

Îşev dîsa hîv
Li ezmana çiqas xweş e
Meriv serxoş dike
Dixwaze bi yarê ve
Li bin bimeşe

Xwazî tu jî hebî
Li çiyayên Înê Gewr
Taldî zinarekî li
Kêleka min bî

Tu jî xwe bikişînî
Hundirê xwe
Wê hewê
Yek jî
Xweş xweş
Guh bi serdimî
Qebe qeba kewê.

Mem Xelîkan

www.arsivakurdi.org

Amed Tîgrîs

Berî dîrokê mirov û ziman

amedtigris@hotmail.com

Gelo ziman kengê derketiye holê? Xwedê pêşî ziman an mirov afirandiye? Li gor Tewratê Xwedê pêşî Adem afirandiye û piştre di demeke kurt de Adem dest bi axaftinê kiriye. Emrekî weha jê re hatiye xwarê: "Xwedê erd û asîman, hemû ajel(heywan) û çûkan afirandiye û divê tu nav li wan bikî!..." Ev xebata Adem a pêşîn e. Adem dest pê kiriye û nav li tiştên derdora xwe kiriye.

Ji aliyê din ve, di Încîlê de dinivîse ku Xwedê berî Adem roja pêşî ronahî afirandiye. Herweha Xwedê berî ku cîhan û jîndaran biafirîne bi vê gotina "roja pêşî ronahî bû", ew bi xwe axivîye. Hîn tu kes û jîndar tune bûne, gelo Xwedê bi kê re axiviye û behsa roja pêşî kiriye?

Belê ev du dîtinên dînî ne û dînê îslamê jî nêzîkê van herdu dînan tiştinan dibêje. Em niha ji cîhana dînî derkevin û berê xwe bidin cîhana zan yarî, gelo ew çi dibêje?

Du dîtin û metodên zanyarî

Skeletên kesên serdemên berê(serî, çenik û xazmîg). Arkeolog li ser amûrên(aletê) dema kevin radiwestin, lêdikolin. Gelo mirovan di wê demê de amûrên ji kevir an jî ji hestî bi kar anîne? Li kolan û îşaretan dinêrin. Periyod bi periyod derdikeve û li ser tê lêhûrbûn. Bi van materyalan diyar dibe ku di van 40 hezar salên dawî de, huner û westatiya mirov derketiye holê. Wek nimûne alet çêkirine û bi kar anîne. Ji van jî fêm dibe ku ji bo vê kar û hunerî ziman pêwîst e û ziman hatiye bi kar anîn, kêm zêde wek rewşa niha bûye.

Belê, du mîlyon sal berî niha ji kevir alet hatine çêkirin. Lêbelê li ser van aletên kevirî zêde nîşan tune ne ku binimînin hunermendî hebûye. Loma arkeolog dibêjin, "ziman 40 hezar sal berî niha bi kar hatiye, lê dikare ev dem hîn zêdetir û dirêjtir be. Dibe ku mîlyon sal be. Bi rastî lêkolînvan û arkeolog jî baş nizanin, di destê wan de encameke berbiçav nîne, ev bi tenê pêşbînî ye.

Arkeolog ji formê mirovê pêşî re bi latînî dibejin, "homo sapîen sapîen. Homosapîen sapîen formê 150.000 sal berî niha ye. Ji vê demê ve organên axaftinê û mejî wek mirovê dema niha ye. Ziman bi hêsanî geriyaye, mejî nêzîkî dema me ye. Yên berî wê demê serî, çenik û mejî ne wek mirovên dema me ye.

www.arsivakurdi.org

Zimanê axaftine çawa peyda bû?

Bersiva vê pirsê gelek aloz, ne zelal û zehmet e. Ziman sîstemeke guherbar e û tim li pêş dikeve. Têkilî û dan û standinê ziman tim bi pêş xistiye û dixe. Ev sîstem weha bi peş ketiye ku mirov dikare di demekê de bûyer û pêwendiyên aloz û têkil pê çareser bike. Ev sîstema pêwendî û têkiliyan, ji ya ajelên guhandar cudatir û dewlementir e. Lê niha gelek aliyên mirov û ajelan ên wek hev hene. Deng u nîşan an jî sînyalên ku ji dev û boriya nefesê dertê, ajel jî wê sîstemê bi kar tînin. Wek nimûne kûçik diewite an direyî, pisîk dinawe, hesp dihîre, mîh dikale, kew dixwîne. Mesela gelek sînyal û hestên kûçik hene:tirs, sempatî, êrîş ûhwd. Tê gotin ku meymûn di vî warî de xwediyê gelek îşaret û sînyalan e. Dı sîstema ajelan de asta sînyal û dengan ne zelal û diyar e. Lêbelê ya mirov bi pêş ketıye.

Îro di her zimanî de, di navbera 30-40 dengên cuda cuda hene. Ev dengên cuda an guhertî tên ba hev û axaftin derdikeve holê. Dema mirov bala xwe bide ser zarokên biçûk, ew dengên bi hejmar û sînor derdixin. Deng dubare, çendbare dibin.

Ji dengê bi hejmar û bi sînor çêkirina dengê bêjmar û bêsînor

Belê, di her zimanî de hejmara dengan bi tixûb(sînor) e. Li gor zimanan di navbera 30-40 dengan de ye. Teknîka ziman bi van dengan bi tixûb e, dengê bi tixûb çedike. Tîp dibin kîte, kîte dibin gotin û gotin tên ber hev hevokên watedar an jî bi wate çêdibin. Sîstema axaftinê ev e. Ev sîstema axaftinê demeke dûr û dirêj girtiye. Dibe ku ev dem 40 hezar sal an jî 2 mîlyon sal bın. Ev pêşbînî ye û kes rastiya vê sîstema axaftinê baş nizane.

Belê, wek me hinek berê jî destnîşan kiribû ajelên guhandar jî, di nav xwe de çendek sînyal û îşaretan bi kar tînin. Wek mînak: dema mirîşk paşokek an teyrek dibîne, qide qid dike, ji çûçikên xwe re dibêje "xwe veşêrin dijmin hat!"

Sîstema dugotinî

Tê gotin ku mirovên pêşî bi yek gotin an jî tek gotinî peyivîne. Dema nêzîkî hev an jî rû bi rû bûne hev fêmkirin hêsantir bûye, lêbelê dema ji hev dûr ketine zehmetir bûye ku ji hev fêm bikin. Gotinên hêsa ber bi yên zehmet û zor diçin. Wek mînak: Here kewek bigre û bîne. An here bexçe sêvek bigre û bîne. Dibe ku di şûna van herdu hevokan de weha hatibe gotin: "Kew bigre!" an "sêv bîne!"

Hîn di serdema kevirî ya kevin de ziman gelek pêşketiye û hatiye guhertin. Di serdema nêçîrvanî ku kevir û hestî wek amûr an jî alet hatine bikaranîn.

Zimanê pêşketî û paşketî

Sîstema ziman, bi tevî deng, formê tewandî, çêkirina gotin û danîna hevokan e. Hejmara gotinan, biwêj û gotinên mezinan ku mirov bikaribe wateyeke bide wan bêjeyan fêm bike. Zimanê nivîsê, tradisyonona zimanê nivîsê, berhem û çand hene. Berhemên nivîskarên bi nav û deng hene, Ev hemû nîşana zimanekî pêşketî ye.

www.arsivakurdi.org

Zimanê paşketî an jî paşmayî çi ye? Bervajiyê vê rewşê ye. Ziman ji bo nivîsandinê ne xwedan qaîde û prebsîban in. Yektîya ziman tune ye. Ziman beyar maye. Çanda wê ya foklorîk nehatiye berhevkirin û neketiye xizmeta gel, herêmî û devkî maye. Berhemên navdar û nivîskar û helbestvanên navdar tune ne.

Serdema nêçîrvanî û berhevkariyê

Tê gotin ku di serdema nêçîrvanî û berhevkariyê de ziman bi pêş neketibû. Niha li Afrîkayê li welatê bi navê Botswana xelkek dijî ku navî wî xelkî San e. Ew hîn îro jî di serdema nêçîrvanî û berhevkariyê de dijîn. Hemû hejmara sanan 20 hezar in. Yanî bi qasî nifûsa gundek in. Lê hemû ne li gel hev in, li cografiyeke berfireh û belav dijîn. Zimanzan û zimannasên cîhanê li ser wan û zimanê wan lêkolînan dikin. Hemû lêkolînvan li ser zimanên wan gehîştine encameke ku di navbera zimanê wan û yên Ewropiyên îro de ferqeke weha mezin tune ye. Wek tê zanîn li ser zimanê Hîndîyaniyan jî lêkolîn hene, di zimanê wan de jî hîn di sîstema deng de ne.

Lêbelê di van salên dawî de, di ziman û çanda wan de guhertineke bi lez û bez pêk hatiye. Navê zimanê wan xoinsan lêkirine. Sîstema grameriyê di zimanê wan de heye lê gelek tişt kêm in. Wek mînak cînavê kesîn yê yekem"ez" û "em" tune ne. Di lêkeran de sîstema demî heye. Di zimanê wan de hejmara dengan nêzîkî sed dengî ne. Belê ji derî van li çolên Awustraliyayê jî xelkek weha hîn dijî.

Gencîniya ziman û komaleyetî

Gencîniya(xezîneya) her zimanî cihê cihê ye û bi jiyana komelayetî(civakî) ve girêdayî ye. Di pratîka rojane de, her ziman tê guhertin. Ev guhertin li gor pêwendiyên derdorê û pêwestiyan ziman tê guhertin. Zimanê ku ji bo pirçandî tê bi kar anîn gencîniya wî gelek dewlemend dibe. Wek tê zanîn di zimanê nivîsê de gencîniya gotinan zêde ye. Herweha civatên îndustrî û teknîkî weha ne, li wan civatan ziman li pêş dikeve. Pêwîst e ku bersiva berhem û berhemdariyên nû bide, bersiva îcad û navû û terîmên taze bide. Her ku bersiva wan dide gencîniya ziman dewlementir dibe.

Ziman li gor bersiva pewîstî û hewcedariyan e. Wek nimûne zimanê Sanî li gor hewcedariyên nêçîrvanî û berhevkariyê ye. Di zimanê wan de navên gelek hişînahî û heywanên ku hene, di zimanên din yên pêşketî de tune ne. Herweha gotinên ji bo têkiliyên nav civatê, ji bo jiyan û mirinê jî hema hema wek zimanê ewropiyan e. Di zimanê wan de ji bo bûyerên romantîk jî gotin hene. Dema mirov li ser kurdî jî hûrkolînek bike, dibîne ku di warê çandinî û heywan xwedî kirinê de gelek dewlemend e, lê di warê teknîk û jiyana civakî ya rêxistinî de gelek lawaz e. Ji ber ku ne bûye zimanê nivîs û dewletê.

Lêbelê di zimanê San de helbet gotinên wek otomobîl, tv, mal, mobîlya,

www.arsivakurdi.org

kinc, xanî tune ne. Dîsa gotinên wek, polîs, general, top, tufeng, elektrîk, rêxistin, komele tune ne.

Di zimanê wan de matematîk heye lê bi pêş neketiye. Hejmar heta 6an hene û ji wir bi jor ve tune. Lêkom(+) û jêkom(-) jî tune ne. Hûn dikarin bêjin zimanê wan ê nivîsê çawa ye? Ew hîn di serdema kevir de dijîn, di wê demê de û zimanê nivîsê?

Navê zimanê xwe nizanin

Her malbateke sanî bi zimaneke cuda dipeyîve. Kes baş ji kesî din fêm nake. Di navbera koman (grûban) de têkilî tune ne. Her komek bi dehan in. 10-15 zimanên wan hene. Her kom ji hev dûr dijî. Yanî her komeke zimaneke wê yê taybetî heye.

Belê dema Ewopî çûn Awustralyayê jî, li wir bi qasî 200-250 ziman hebûn, di navbera 200 salan de zimanê wan ji holê rakirin.

Zimanekî nû û deng

Du kom dema zimanê wan ne wek hev bin, dema di nav wan de têkilî tên danîn, di hinek tiştan de ji hev fêm dikin, nêzîkî hev dibin. Gotin ji hev digrin an jî ji hev deyn dikin. Gelo ji van herdu koman dê zimanê kîjan li ser ya din bandor(tesîr) bihêle? Ev girêdayiyê cure û rengên pêwendiyan e. Desthilatdarî(îqtîdar) di destê kîjan de ye. Ziman karê dîrokê ye, gelek zeman digire. Lê carinan dikare di demeke gelek kurt de guhertinên mezin û bingehîn pêk bên. An jî gotinan ji zimaneke din bigre. Lêbelê rastiyek heye, deng zû nahê guhertin. Bi zimanê nû dipeyive lê deng yê zimanê kevn e. Mirov dikare di vî warî de mînakeke jîndar û berbiçav ji bo zimanê me bide. Li Tirkiyeyê li kurdan binêrin û li tirkiya tirkan binêrin, ji aliyê deng ve ferqeke gelek mezin heye. Kurd, gotinên tirkî wek kurdî bi lêv dikin. Bi piranî deng ji qirikê derdixin. Divî warî de tirkên li Ewropa dema bi almanî dipeyivin gramatîka almanî berbat dikin. Çawa ku yekî alman bi tirki dipeyive u li gor almanî difikire û bi tirkî dipeyive:Ben var gelmek …

Hînd-ewropî

Li gor pêşbîniyên arkeolog û zimannasan, berî niha bi 100 hezar salan însan ji parzemîna Afrîkayê derketine û li cîhanê belav bûne. Di wê demê de sînyal û zimanê wan ê wê demê helbet yek bûye. Ew komên biçûk her ku ji hev dûr ketine, têkilyên wan li gel hev nemane, ziman jî hatiye guhertin. Her kom li gor cîh û derdora xwe sînyal û gotinên nû çêkirine an jî dîtine.

Bi destpêkirina çandiniyê re, hinek herêm û dever ji yên din bêtir hatine tercîhkirin. Her komî xwe daye dol, ber çem û newalan. Cîh û warên avî û bi dar û ber. Dîcle, Firad û Nîl di vî warî de roleke mezin û girîng lîstine. Bûne dergûşa çandinî, heywan kedî û xwedî kirin û şaristaniyê. Li pêş çem û avan bendav, sukur, medreb hatine avakirin. Şaristanî, huner û hunermendî, ziman û nivîs li wir dest pê kirine û kamûran bûne. Li ber Dîcle û Firadê bajarên wek Ur, Uruk, Babîl, Nînova

www.arsivakurdi.org

hatine avakirin. Şaristaniyên wek Sumer û Akadan piştre hatine avakirin.

Li Mezopotamyayê

Li gor lêkolînên arkeologan cara pêşî sumerî li Mezopotamyayê berî zayînî (bz) li derdora salên 3.500î li ser kevir û lewheyên axikî bi awayekî sîstematîk wêne kolane. Piştre wêneyên xwe hêsan çêkirine ku mirov têbigehîje. Ji wêneyên weha hêsan û sîstematîk re pîktogram dibêjin. Ji ber ku sumerî wêneyên xwe li ser heriya şil û bi kam nivîsîne,detayên wan ji aliyê arkeologan ve baş nehatine xwendin û fêmkirin. Piştî sala 3.000î sumerî pîktogramên xwe bi pêşxistine û wek nivîsar li ser lewheyên axikî yên biçûk nivîsîne. Ji wan lewheyên axikî hinek ji wan di firinan de şewitandine û hinek ji wan jî li ber tava rojê hatine şewitandin.Wek nimûne, dema wêneya rojê bê çêkirin, divê weha basît û hêsan be ku ji aliyê herkesî ve were naskirin û zanîn. Lê bi tenê ne çêkirin, herweha ew kesî ku wêneya rojê bibîne jî, bizanibe ku ew di wateya "roj" an "demê" de hatiye çêkirin. Ku "roj" sembol û nîşana "dem" an "zeman" bûye. Ji wêneyên weha yên watedar re îdeogram dibêjin.

Herweha sîstema pîktogram û îdeograman gelek zehmet û tevlihev bûne û ji ber wê yekî sumeriyan bi qasî 2.000 sembol bi kar anîne. Di proseseke din de kîte şûna wêne girtine û ji wê forma kîte-wêne re îro dibêjin fonogram. Fonogram di prosesa nivîsîna sumerî de pêngaveke gelek pêşketî bûye, xwendin û nivîsandinê hêsantir kiriye. Herweha bi alîkariya fonogramê hejmara sembolên sumerî ji 2.000î daketine 600î.

Mîtolojiya Gilgamêş bi wê nivîsara lewheyî hatiye nivîsîn. Mirov dikare bêje ku bi nivîsîna mîtolojiya Gilgamêş çîrok û romana yekemîn hatiye nivîsîn. Bingehê wêjeya nivîskî bi nivîsîna Gilgamêş re dest pê kiriye. Gilgamêş lawê Lugalbanda bûye û bi kêmasî ew qehremanê pênc helbestên sumeriyan e. Gilgamêş bi xwe padîşahê sumeriyan yê bajarê Ûrûk bûye. Li gor mîtolojiyê ew nîv Xwedê û nîv însan bûye. Gilgamêş li pey mirinê geriya ye û piştî gelek bûyer û serpêhatiyên mezin û dijwar ne dermanê mirinê lê dermanê ciwanbûnê dîtiye. Lêbelê berî ku ew dermanê ciwanbûniyê bixwe marekî reş ew derman xwariye û herweha ciwanbûn jî ji destê Gilgamêş çûye. Gilgamêş di nav qehremanên epoyiyên akadî de jî gelek populer bûye. Varyanta mîtolojiya Gilgamêş ya herî baş bz di salên 668-627an de li ser 12 lewhayên suryanî hatine nivîsîn û ji aliyê padîşahê asurî Assurbanîpal ve li pirtûkxana Nînovayê hatine komkirin.

Zimanê sumerî heta 2.000 salên bz hatiye û ji wir bi şûn ve, him zimanê devkî û him jî zimanê nivîskî miriye. Arkeologên Ewropî piştî zayînî di salên 1800 de li Mezopotamyayê li ser ziman û çanda sumeriyan lêkolînên hûr û kûr kirine, di dawiyê de gehiştine wê baweriyê ku îro li cîhanê tu gel nîne ku bi zimanê sumerî dipeyive. Lê piştî sumeriyan heta demekê li herêmê asûrî, babîlî û akadî bi zimanê sumerî nivîsandine. Ew jî piştre destpêkirine û bi zimanê xwe nivîsîne.

Piştî zayînî di 1920î de arkeologan li

www.arsivakurdi.org

Boxazkoy di lêkolînên xwe de rast hatine ku Hîtîtan jî bz di salên 3.100î de nivîsarên taybetî bi kar anîne. Zimanê Hîtîtan zimanekî hînd-ewropî ye.

Li Misirê

Li gor lêkolînan bz di salên 3.000î de li Misirê jî bi navê hieroglîf wêneyên yekbêje li ser keviran hatine kolan. Herweha ji wir bi şûn ve prosesa nivîsê li Mezopotamya û li Misrê ji hev cuda lê peralel dom kirine. Du varyantên nivîsara misirî hene: Hîeroglîf û hîeratî. Hîeroglîf li ser dîwar, kevir û metalan û hîeratî jî li ser papîrûs hatine nivîsîn. Di salên 700î de hîeratî bi pêşketiye û ji gotinê derbasî kîteyan bûye û bi îtalîk hatiye nivîsîn. Piraniya nivîsarên misrî yên kevn li ser kevirên goristanan hatine nivîsîn. Ango goristan bûne dibistan.

Akadî di salên 2.500î de nivîsara sumerî digrin û bi pêş dixin. Lê bi tenê di karê burokrasiyê de bi kar anîne.

Di salên 2.400î de vê carê Hîtîtî nivîsara Akadiyan wek nimûne digrin, bi ya xwe re muqayese dikin û nivîsara xwe xurt û bi pêş dixin.Di salên 1700î de Hammûrabî dibe padîşahê Babîlê.

Tê texmînkirin ku di dema çêkirina Pîramîdan de bi hezaran însan heman(eynî) zimanî peyivîne. Kar û çandiniyê zimanê wan yek kiriye. Misir di warê yek zimanî de nimûne ye.

Grekî û zimanê nivîsê

Dı dema antîk de her bajar bi devoka xwe dipeyiviya. Platon bi devoka xwe ya Atînayê nivîsiye. Ji ber ku di wê demê de dibistan tune bû, her kesî wek devoka xwe dinivîsa. Ew tradîsyon niha jî li Ewropayê heye ku hinek nivîskar bi devoka dinivîsin.

Ji bajarên biçûk ber bi împaratoriyan ve

Berî zayînî di salên 400î de Atinayê bal û girîngiyê da ser bajarên din. Wek tê zanîn bz di sala 330î de Aleksander ji Mekedonya, Atîna û hat Kurdistanê de ber bi rojhilat ve sefer kir.

Latînî û romî

Di destpêka serdema Romayê de, li Îtalyaya îroyî gelek bajarên biçûk hebûn û her yek bi serê xwe dewletek bû. Roma bz di 753an de hatiye avakirin. Wê demê latînî li devereke gelek teng de dihatin axaftin. 100 sal piştî Îsa latînî mezin û berfireh bû hemû Ewropayê, Misir hat heta Îranê çû. Heta 400 salî pz dom kir. Latînî heta salen 600 dom kir alfabeya latînî piştre bû alfabeya etrûskî.

Guhertina zimên

Guhertina zimên bi çend mercên girîng ve girêdayî ye. Ji wan yek an çend dema pêk werin dikarin ziman biguherin: Perwerde, têkilî bi civat û cîhanê re, pere, desthilatdarî û psîkolojiya biçûkbûnê. Dema mirov van mercan yek bi yek bigre berçav, wê demê dikare bêje ku em çima bi tirkî dipeyivin.

Latînî, îtalî û Dante

Zimanekî çawa wenda dibe û dimire? Yek ji wan zimanên herî mezin jî latînî bû ku li demeke dûr û dirêj li seranserê Ewropayê bi latînî dihatin nivîsîn. Lêbelê xelkê jê fêm nekir û nedixwest

www.arsivakurdi.org

pê bipeyive. Ji wî zimanî, îtalî, fransî û spanî jê derketin û bûn zimanê nivîsê. Ewropiyên din her yekî bi zimanê xwe nivisî. Herweha demek şûn de latînî ji holê rabû.

Dante pêşî bi nîv latînî û nîv îtalî nivîsî. Lê bi îtalî bi devoka xwe. Lê Dante bi xwe nizanibû ku ew devoka ku pê dipeyîve, devokeke îtalî bû. Piştre hêdî hêdî bi îtalî hat nivîsîn û îtalî navê xwe girt.

Serdema zimanê netewî

Li seranserê Ewropayê li dij zimanê latînî dîtin û ramanên netewetî dest pê kir. Mirov dikare bêje ev dem ji 1200î heta 1800î dom kir. Dema mirov di sedsala18an de li Ewropayê meze dike, dibîne ku burjûvajî li dij desthilatdariya dêran û derebegên biçûk radibe û dewletên netewî ava dikin. Derebeg an jî mîrayetî li ser desthilatdariya netewî li hev dixin. Yên bi hêz dest didin ser ax û malên yên lawaz(qels) û desthilatdariya wan ji navê radikin.

Dewlet, dibistan û ziman

Kes nizane ku kê gotiye bila zarok herin dibistanê. Lê grekî û romî li ser riyeke weha bûn. Zarokên grekiyan bi tenê hînî xwendin û nivîsînê dibûn. Lê zarokên romiyan divê him hînî latînî û him jî hînî greki bûbûyan. Împaratoriya Romê xwedî du zimanê fermî bû. Bi ketina Romayê re dêr û manastiran rola dibistanê girtin ser milê xwe. Dibistan her çiqas di salên 11 de dest pê bikin jî nikaribû bi rêk û pêk be.. Heta salên 1500î ji derî latînî ferheng, pirtûk û materyalên din tune bûn. Heta salên 1800î xwedin di dêr û katedralan de dibûn; nedihiştin li derî dêran xwendin hebe. Di dest de çi diman diviya bû ku mirov xwe bi xwe li derî dêrê xwe hînî xwendin û nivîsînê bike. Di navbera salên 1400-1500î de guhertinên gelek mezin çêbûn ku ji vê re dibêjin Ronesans. Di salên 1500î û şûn ve, li seranserê Ewropayê xelkê zixt da ser dêran ku xelk bi zimanê xwe bixwîne û binivîse. Dêrên katolîk li dij wê derdiketin û digotin "latînî zimanê dîn û dêran e, divê ev dom bike…" Ango li Ewropayê dîn û ziman bi hev ketin. Helbet Luter serê ve pirsê dikişand. Şer li Îngîlistan, Danîmark û li Swêdê dom kir. Wê demê Dêrê him Papa û him jî padîşah temsîl dikir. Heger Încîl bi îngîlizî, danîmarkî û swêdî be, divê nivîs jî bi wan zimanan bin. Luter bi xwe di serî de pozîtîv bû ku di dêr û dibistan de perwerde bi almanî be. Piştre bi paş ve gav avêt û latînî xwest.

Piştre li derî dêran dibistan hatin avakirin û di dibistanan de jî ders bi latînî bû. Zimanê xelkê yan jî yê dayikê tune bû. Latîniya wê demê wek îngiliziya niha gelek popîler bû. Sal bi sal latînî lawaz bû û wenda bû. Cara pêşî di sala 1492an de rêzimana spanî hat çapkirin û weşandin. Piştre îtalî û fransî dest pê kirin. Dewletên netewî xurt bûn kralan dîreksîyona welêt girtin destê xwe. Latînî di hundirê dêrên katolîk te ma. Belê latînî ji navê rabû, dibistanê şûna dêran girt lê perwerde dibistanan de jî dînî bû. Belê latînî piştî ketina Romayê 1000 sal li Ewropa jiya û piştre mir. Latînî mir lê zarokên wî man ango ji-

www.arsivakurd.org

yana xwe bi rengekî din domand. Lê rengên mirinê yên din jî hene ku ev kadastrofên mezin in.

Mirina zimanek

Ziman çawa wenda dibe an jî dimire? Îro perwerdeya dibistanê li her welatî bêtir û gurtir dibe. Piraniya zimanê biçûk li derî dibistanê dimînin. Bazirganî û komunîkasiyon (dan û standin) û têkilî zêde dibin û dinya teng û biçûk dibe. Lênêrîna nexweşiyê, kar, bac û xizmetên civakî û hwd der û dor li zimanê biçûk teng dike. Zimanê lokalî êdî bi kar nayê. Ew zimanên biçûk, êdî nikarin xwe li ber hêza teknîk, masmediya û bi taybetî mediya bi wêne biparêze. Mirov li meqamên fermî, li dem û dezgehan nikare bi zimanê xwe derd û giliyên xwe bike û daxwazên xwe pêşkêş bike. Çandinî û ajel xwedî kirin êdî têr nake. Gundîtî rabû û bajarvantiyê dest pê kir. Di vî warî de îro li Amerîka û Kanada îndiyanî û li vir jî rewşa me kurdan hema hema wek hev in.

Li Skoçyayê zimanek hebû ku jê re digotin zimanê gelî. Ev ziman her ku diçû li ber zimanê înîlîzî qels dibû. Di sed salên dawî de wenda bû. Heta salên 1700î piraniya xelkê bi gelî dipeyivî. Xelkê wê demê di nav zeviyên xwe de çandiniyê dikir. Demek hat gundiyan dev ji çandiniyê berdan û dest bi xwedîkirina ajelan kirin. Goşt û hiriya xwe firotin îngîlîzan û çûn peravê ku masivanî bikin. Di 1800î de zimanê dêrê îngîîzî bû. Piştre dema li dibistanan dest bi perwerdeyê kirin, vê carê ziman bû îngilîzî. Bazirganî, lênêrîna nexweşiyê, komunîkasiyon diviya bi îngîlîzî bûya. Di destpêka 1900î de jî herdu ziman gelî û îngîlîzî li gel hev dimeşiya. Herweha îngîlîzî ji vir bi şûn ve ket nav gundiyan jî. Li mal dest bi îngîlîzî kirin. Îngîlîzî bû zimanê yekem. Zimanê wan bû zimanê kal û pîran, xwelî seriya, îş qedîya. Di navbera 100-150 salî de ev ziman wenda bû. Zimanê wan yê nivîsê jî ji bo zimanzanan di arşîvê de ma.

Di 26ê meha 12an a sala 1777an de li Îngîlistanê li gundê Mouseholê pîrejineke 102 salî bi navê Dolly Pentreatn mir. Navê vê pîrejinê li cîhanê belav bû. Gelo Çima? Ji ber ku li cîhanê ew bi tenê mabû û ji derî wê kesekî din bi zimanê kornîkî nizanibû. Zimanê pîrejinê ango kornîkî nêzîkî zimanên Walensî û Skotlandî bû. Belê di 300-400î de, bz xelkê herêmê bi zimanê xwe dipeyivî Anglo Saksoniyan welatên wan dagîr kirin û ji wê rojê bi şûn ve pêşî axa wan û piştre jî ziman û çanda wan hat dagîrkirin û bi pîrejinê re xelk û zimanek bi hev re mirin û çûn.

Mînaka sêyem: Di 10 hezîrana sala 1898an de li Adrîyatîkê di bûyereke deryayî de qeyîka Antonîo Udîna noqav bû. Antonîo bi serê xwe bû ango bi tenê bû, lê hezar mixabin ew bi tenê nexiniqî, bi hezaran kes bi antonîo re xeniqîn. Ev çawa dibe? Belê zimanî talmatî jî bi Antonîo re noqav bû. Herdu bi hev re xeniqîn. Dalmatî şaxeke ji zimanê romê bû. Di navbera Sirb û îtalyayê de li çend giravan dihatin axaftin. Di dema xwe de, di navbera Roma Rojhilat û Rojava de wek pirek bû. Herî zêde nêzîkî zimanî albanî bû.

www.arsivakurd.org

Li Afrîkayê

Li Afrîkayê Şîyeyî li malê bi zimanê xwe napeyivin, ew bi zimanê fermî yê satiswanî dipeyivin. Ji bo zarokên wan bi baş bi ziman bizanibin û li dibistanê jêhatî û serketî bin. Herweha êdî nifşên nûhati bi zimanê xwe nizanin.Bi destê xwe zimanê xwe dikujin. Îro rewşa me û wan hema hema yek e.

Gelo mirî zindî dibin?

Miriyê ku zindî dibe jê re qûnşeytanî bûye dibêjin. Ez bawer nakim ku kesê mirî zindî bibe. Lê ez tiştek baş dizanim ku zimanê mirî carinan zindî dibe. Him jî piştî 2000 salî dikare ji gorê serê xwe rake û zindî bibe. Gelo rewşa zimanê hebrî weha ne bû? Ew hîn di serdema xirîstaniyê de miribû û tenê di tekstên pîroz ên Tewratê mabû. Piştî 2000 salan carek din zindî bû. Niha bi vî zimanî dewleteke nûjen û civateke nûjen pê tê birêvebirin.

Bi giştî li cîhanê di van 100- 200 salên dawî de rewşa ziman

Li gor statîstikan di van 100-200 salên dawî de hejmara nişteciyên cîhanê 7-8 qat zêde dibe. Heger rewşa polîtîk û civakî weha dom bike, dê di van 100-200 salên dawî de 5000 ziman ji navê wenda bibin. Zimanên mezin dê mezintir û xurtir bibin. 200 sal heşt nivş dike. Ji bo guhertina zimanên biçûk sê nifş têr dike û zêde ye jî. Swêdî bi xwe ditirsin ku dê zimanê wan di van 200 salan de wenda bibe û îngîlîzî bide ser. Zimanê swêdî îro him yê dibistanê û him jî yê dewletê ye.

Zimanê pêşerojê

Niha li cîhanê bi 5-6 zimanê mezin bi qasî mîlyarek mirov pê dipeyivin. Hemû nifûsa cîhanê 5 mîlyar e. Zimanê ku însan pê kêm dipeyivin di talûkê de ne. Ziman ne stabîl e. Yek dikare wenda bibe û yê din dikare ji nû ve kulîlk veke. Niha gelek ziman hene ku hîn di prosesa kevirîn de ne. Di van 3000 salên dawî de gelek ziman bi pêşketine û gelek ziman jî mirine. Bi taybetî di dema îro de zimanên biçûk wek dema berê zê de an jî demeke dûr û dirêj nikarin li ber xwe bidin û bi lez û bez wenda dibin. Dibistan û masmediya di warê helandinê de roleke mezin dilîzin.

Guncandina zaraveyan

Çawa zimanê mezin an jî yê nivîsê yê zora zimanê axaftinê dibe, herweha zaravayên mezin jî zora zaravayên biçûk dibin û wan dadiqurtînin. Îro li başûr zaravayê soranî zaravayên wek kurmancî, hewremanî, feylî ji navê radike. Li bakur jî zazakî weha ye. Yan ber bi kumancî ve diçe yan jî asîmîle dibe û wenda dibe. Giranî di bin bandora tirkî de dimîne.

Not: Ev nivîs ji amidakurd.comê ji ber aktualiteya zimên hatiye girtin.

www.arsivakurdi.org

Amed Tîgrîs

Irak Kürdistani`nda Kürt Ulusal Kurtulus Mücadelesi

Pirtûka Şekroyê Xudo Mihoyî ya ku di sala 1991ê de bi rûsî, bi navê *Kurdisky nasyonalniy vopros v Irake'noveyshee'vremya* derketibû, niha weşanxana APECê wê wergerandiye ser zimanê tirkî. Pelîn Zerdelî pirtûkê wergerandiye tirkî û çend roj berê niha pirtûk bi navê *Irak Kürdistaninda kürt ulusal kurtuluş mücadelesi* (Li Kurdistana Iraqê têkoşîna rizgarî ya netewî ya kurd).

Di nav kurdan de, bi taybetî di nav kurdên Bakur de heta niha Şekroyê Xudo Mihoyî wek Şakirê Xido dihatin nas kirin. Heta bi navê Şakirê Xudo çend pirtûkên wî jî hatibûn çap kirin. Ev ne ras t e. Navê wî yê rastîn Şekroyê Xudo Mihoyî ye. *Irak Kürdistaninda kürt ulusal kurtuluş mücadelesi* 12 beş û 254 rûpel e. Ji ber ku pirtûkeke lêkolînî ye di dawiya wê de gelek not û çavkanî hene.

Her çiqas nivîskar di wê demê de di bin bandora Sovyetê de be û li go polîtîka Sovyetê ya wê demê xwe sînor bike jî, dîsa car caran polîtîka Sovyetê ya li ser Kurdên Başûr di cih de nabîne. Lêbelê bi hest û çavekî kurd û kurdperwerî nivisîye. Rexne û ramanên nivîskar rengîn û piralî ne. Pirî caran pesnê Partiya Komunîst a Îraqê dide û carnan jî rexne lê digre.

Hinek bîrûbariyên dema Sovyetê di pirtûkê de hene. Nivîskar rexne li polîtîka Amerîka û Ewropayê ya wê deme digre. Divê neyê ji bîrkirin ku ev pirtûk di demeke



weha de hatiye nivîsîn. Îro polîtîka Amerîka, dewletên Ewropa û ya kurdan ji binî ve hatine guhertin. Ew Amerîkaya ku di wê demê de rexne li polîtîka wê ya li ser kurdan dihatin girtin îro bi kurdan re li Îraqê di heman berey (cepheyî) de li gel hev kar dikin. Divê mirov vê pirtûka nivîskarê kurd Şekroyê Xudo Mihoyî li gor wê demê bixwîne û binirxîne. Li gor wê demê dokumenteke gelek baş û bi kelk e. Pirtûkeke weha li ser dîroka me kurdan ya dema nêzîk divê di pirtûkxaneya her kurdekî/e xwende de hebe.

www.arsivakurd.org

Şekroyê Xudo Mihoyî



Şekroyê Xudo doktorê zanyarîya dîrokê, profêsor, akadêmîkê Akadêmîya Zanistîyê ya Ermenîstanê (ji sala 1990î), akadêmîkê Akadêîya Rûsîyayê ya hiqûqetîyê û bêqezîyabûnê (ji sala 2002an), serokê Navenda Lêkolînên Kurdî li Moskvayê, xebatkarê sereke yê Înstîtûta Rohilatzanîyê ya Akadêmîya Rûsîyayê ye.

Ji diya xwe bûye sala 1930î, li gundê Elegezê, li Ermenîstanê.

Piştî temamkirina fakûltêta dîrokê ya Zanîngeha Yêrêvanê ya Pêdagogîyê, bûye mamostayê dîrokê li gundê Elegezê. Di salên 1955-56an da serokê beşa rojnameya kurdî "Rya teze" bûye, lê ji sala 1956an heta 1960î cîgirê berpirsyarê rojnameyê bûye. Ji sala 1960î karê wî yê esasî dîroka Kurdistanê ye li Înstîtûta Rohilatzanîyê (beşa kurdzanîyê) ya Akadêmîya Ermenîstanê ya Zanistî da. Di salên 1981-1994an da serokê beşa Kurdzanîyê bûye li vê Înstîtûtê. Di salên 1968-1994an da bûye lêktorê dîroka kurdan û welatên ereban li fakûltêta Rohilatzanîyê ya Zanîngeha Ermenîstanê.

Şekroyê Xudo xudanê ji 150 zêdetir xebatên zanistîyê ye, di nava wan da 10 pirtûk, ku hemû jî derheqa dîroka kurdan û Kurdistanê da ye. Pirsgirêkên wan yên bingehîn ev in: şerkarîya kurdan ya ji bo azadîyê, faktorên navnetewî di pirsgirêka kurdan da, rola îslamê di dîroka kurdan da, îdêologîya tevgera kurdan, manî û bingehên nakokîyên di navbera partîyên kurdan da, êzdî û êzdîtî, pirsgirêkên helkirina meseleya kurdan li Îraqa îroyîn da.

Monografîya "Pirsgirêka kurdan li Îraqê di dewra nû da" beşekî karê zanistî yê dîroka Başûrê Kurdistanê ye.

Bi însîyatîv û beşdarîya Şekroyê Xudo cara yekemîn pirtûkeke dîrokî ya bi sernavê "Dîroka Kurdistanê" (ji destpêkê heta dema îroyîn) sala 1999an li Moskvayê hate çapkirinê.

Van dawîyan li Kurdistana Başûr xelata ser navê Pîremêrd ya bona sala 2004an dane profêsorê mezin Şekroyê Xudo. Ango, welatê me zaneyên me nas dike û keda wan qîmet dike.

www.arsivakurd.org

Ji bo avakirina komelan

Destûreke nimûne

Navê komelê

Komela alîkarî û pişgiriya gundê ..... e.

Navenda komelê

Li ..... ye.

Endam û endametî

Gundiyê/a ku armanca komelê bipejrîne serî li komîteya kargêr dide û komîteya kargêr di derheqê endametiya wî/wê de biryar dide. Heqê endametiyê her sal ji aliyê kongrê ve tê diyar kirin. Endamê ku endametiya xwe nede nikare di kongreyê de deng bide.

Armancên komelê

..... ku li derî welat in, wan bi hev bide naskirin, têkiliyên wan germtir dike. Li xerîbiyê kultura xwe biparêzin. Ji aliyê kulturî, civakî û aborî ve ji gund û gundiyên ..... re alîkarî û pişgiriyê dike.

komîteya kargêr

Komîteya kargêr ji aliyê kongreya giştî ve ji 5 esil û 2 cîgir tê hilbijartin. Komîteya kargêr di nav xwe de bi piraniya dengan serok, sekreter û berpirsê aborî hildibjêre. Serok civînan birêve dibe û li der û hundir komelê temsîl dike. Sekreter protokolan digrê û karên fermî dike. Berpirsê aborî jî li karûbarên aborî mêze dike, hatin û çûyînên komelê digre. Heta 500 ewro dikare bi tenê bikşîne heger mîktarê wê zêde be, bi îmza sekreter û serok an jî bi ya wî/ê û ya sekreter tê dikişandin. Karên din jî di nav endmên mayî de tên beşkirin.

Kongereya giştî

Kongreya giştî her sal di meha 12an de dicive. mehek berî kongrê ji hemû endaman re bangeke nivîskî tê şandin û di vê bangê de tarîh, cîh û saeta kongre tê diyar kirin. Kongre ji nîvî zêdetirên endaman vedibe. Heger ji nîvî zêdetirên endaman beşdar nebin, kongre 15 roj bi paş ve tê avêtin û carek din ji endaman re, banga niviskî tê şandin. Cara duyem hejmara endaman ne girîng e, kongre bi endamên beşdar vedibe û karê xwe dimeşîne. Dîwan tê damezrandin û dîwan rojeveke çedike û pêşkeşî kongre dike û li gor wê kongre tê dom dike. Di kongreyê de raporên komîteya kargêr ya xebat û aborî tên peşkêş kirin.Li ser raporan gotûbêj û rexne tên kirin û di dawî de tên dengdanê. Komîteya nû tê hilbijartin. Biryar bi prensîpa piraniya dengan tên qebûl kirin.

Kongreya awerte

Kongreya awerte di du rewşan de tê li darxiştin:
1. Li ser daxwaza komîteya kargêr bi bangeke wek ya normal tê dicive.
2. Dema ji nîvî zêdetirên endaman bi îmza bixwazin kongre bicive, wê demê komîteya kargêr kongrê dicevîne.

Belavkirina komelê

Bi tenê kongra giştî dikare biryara belavkirina komelê bide. Di kongreyê de ji nîvî zêdetirên endaman, dema bixwazin komeleyê belav bikin, komele tê belav kirin. Dema komele were belavkirin, kongre biryara digre ku hemû pere, mal û hebûnên komelê dewrê komele an jî rêxiştineke hevbeş û hevarmanc dike.

www.arsivakurdi.org

Ferhengoka vê hejmarê

aborî, ekonomi, mali
ango, yani
ava, çêkirin, inşa
axaftin, peyivin, deng kirin, konuşma
bang, gazî, çağrı
bazirgan, tüccar
bazirganî, ticaret
belavkirin, feshetmek
berpirs, sorumlu
beş, bölüm, kısım
bz(berî zayînî), milattan önce mö
biryar, karar
bûyer, hadise, olay
cîgir, yedek
cînav, zamir
cînavên kesîn, şahıs zamiri
çand, kültür
çareser, helkirin, çözüm
daçek, proposisyon, edat
dagîrkirin, işgalkirin, işgal etmek
damezrandin, kurmak, inşa etmek
dencî, boyacı
dendan, iplik boyama
deng, ray, oy
dengdan. oylama
derya, behr, deniz
desthilatdarî, iktidar, egemenlik
destûr, tüzük
dibistan, mektep, okul
dîrok, mêjû, tarih
endam, üye
endamtî, üyelik, ödenti
fermî, resmi
ferheng, sözlük
ferhengok. küçük sözlük
gotûbêj, münakaşa
girav, ada
girîng, muhîm, onemli
guncandin, uyum, uyuşma
hest, hîs, tavir
hevenav, cins isim
hejmartina giştî, genel sayım
hevbeş û hevarmanc, ayni amanc
hilbijartin, seçim
kelk, fayda, çıkar
komîteya kargêr, yönetim kurulu
komele, dernek
kongerya giştî, genel kongre
kongeya awarte, olağanüstü kongre
lawaz, jar, zayif
lêker, eylem, fiil
lêkolîn, araştirma, inceleme
nakokî, dijberî, çelişki
navend, merkez
nifş, nesil, generasyon
netewe, millet, ulus
netewetî, ulusal
pejrandin, kabul etmek
pêngav, adım, aşama
pêşeroj, gelecek
pirtûk, kitap
pirtûkxane, kütüphane
rexne, eleştiri
rojev, gündem
rewş,rewz, hal, durum
rêk û pêk, düzenli
rêxistin, organizasyon
serdem, çağ, zaman
serenav, özel isim
şaristanî, medeniyet, uygarlık
têkilî, pêwendî, ilişkî
zanîngeh, zanko, üniversite
zarava, şive, diyalekt
zanistî, zanyarî, ilim

www.arsivakurdi.org

Muzaffer Özgür

Bir pazarlamacının gözüyle bizim oralar

Köyün aşağı tarafında spor sahasının yanındaki boşlukta her hafta pazar günü pazarın kurulduğunu öğrendim. Oraya gidip uzun yıllar sonra bir pazarda gezmek istedim. Annem ve ablam git git senin gibi bir grup var git tanı dediklerinde gitme arzum daha da arttı. Artık müşterilerin azaldığı bir saatte Cemal'i kahveden alarak pazara doğru yürürken bu grup hakkında detaylı bilgiler de aldım. Birazda gazeteci olduğumdan fırsatı değerlendirmek istedim. Onları tanımak ve dergi için bir röportaj yapmak istedim. Bu görüşmeyi şimdi siz değerli okuyucularla paylaşıyorum.



Yilmaz Kızılkaya

Merhaba, sizleri tanımak istiyorum, mümkün mü? Ben Almanya`da kalıyorum Bu yöre Kürtleri ile ilgili çalışmalar yayınlayan Bîrnebûn dergisinin redaksiyon üyesiyim?

– Merhaba Hoş geldiniz. Memnuniyetle. Bizim bir öğrenci kardeşimiz var, o sizinle ilgilensin. Biriniz çay yapsın çoçuklar.“ diyerek teker teker benimle selamlaştılar. sıcaklıklarını hemen his ettirdiler. Öğrenci yanımda kaldı diğerleri tezgahlara dağıldılar.

Kendinizi derğimiz okuyucularına tanıtır mısın?

– Adım Yılmaz Kızılkaya, Ağrı doğumluyum. Yeniceoba`da ikamet ediyorum ve üniversite öğrencisiyim. 1995 yılından beridir bu civar köy ve kasabalarda pazarlama-işporta işi ile uğraşmaktayız.

www.arsiv.org

Ağrı`dan buraya neden? Bu işten dolayı mı? Buraya yerleşme hikayeniz nasıl oldu?

–Hayır işten dolayı değil bizim göcümüz. Oralardaki siyasal, sosyal baskılardan dolayı ayrıldık. Yeniceoba`da akrabalarımız vardı, buraya yerleşir ve güvende oluruz diye geldik. Kürt bölgesi olması bize daha da güven verdi. İleriki süreçte yanılmadığımızı anladık ve yöre insanı ile mükemmel denilebilecek ilişkilerimiz var. Halk bizim yerleşmemize yardımcı oldu. Özellikle bazı insanlar bizlere sahip çıktılar. Bursa`da bir eniştemiz var, o da bizim bu işi yapmamıza yardımcı oldu, bize bir araba vererek başlamamızı sağladı, yöre insanının bizi bağrına basmasıda önümüzü açtı. İşleri büyüttük. Haftalık ciromuz 30 milyar dolayında.

Yani bu çevre Kürt köylerini tanıyorsunuz?

– Tabiiki, Haftanın her günü bir köy veya kasabadayız. Pazartesi- Kelhasan, Salı- Tavşançalı, Çarşamba- Yeniceoba, Perşembe-Cihanbeyli Merkez, Cuma- Kulu merkez, Cumartesi-Kütükuşağı, Pazar-Yeşilyurt. Cihanbeyli ve Kulu merkez pazarlarında değişik köylerden gelen müşterilerimiz var. Tüm yöreyi tanırız.

Genelde gittiğimiz yerlere yıllardır düzenli olarak gittiğimiz için insanlar bizi tanıyorlar, bize güveniyorlar: Genelde kadın ve genç kızlar alış-veriş yapıyorlar, biz bir ekibiz ve kardeşiz, onlarda bizleri ailelerinden biri olarak görüyorlar, tabiiki bunda Kürt olmamızın çok önemli bir etkisi var.

Pazar diliniz nasıl, Kürt olmanız ilişkilerinizde kolaylıklar sağlıyor mu? Sizin dil yapınız ile yöre Kurmancisi arasında iletişim açısından zorluklar yaşıyor musunuz, yöre Kürt insanının dili konusunda biraz bahsetseniz?

